Federaliya demokratîk a

## hemû gelan e

Yûsif got ku Sûriye welatekî kozmopolît e û ji ber ku ew jî li dijî pergala netewedewletê ne pêdivî pê nedîtine ku di nav pêşniyaza Pergala Federaliya Demokratîk a Bakurê Sûriyeyê de behsa 'Rojava' bikin...

# Federalî çareseriya herî guncaw e

Hevseroka Meclisa Dameziriner a Federaliya Demokratîk a Bakurê Sûriyeyê Hediye Yûsif got ku federaliya demokratîk ji bo aloziya Sûriyeyê çareya herî guncaw e

- Yûsif bal kişand ser êrîşên li dijî pergala federaliyê jî û diyar kir ku ji destpêkê û vir ve Tirkiye dijminatiya projeya wan dike û ji bo vê yekê ji rabûye axa Sûriyeyê dagir kiriye. Yûsif da zanîn ku dê Tirkiye li wir têk biçe.
- Yûsif anî ziman ku piştî li Cenevreyê hêzên navneteweyî nekariye aloziyê çareser bikin îcar jî li Astanayê li hev dicivin û wiha got: "Civîna ku federaliyê li ber çavan negire, ew civîn binketî ye."... Hevpeyvîna Bişar DURTGUT RÛPEL - 8

ROJEVA Medya

11 Çile Çarşem 2017 / e-mail: rojevamedya@hotmail.com / Buha: 1 TL Hejmar: 62





## Li ser cenazeyan avahiyan lê dikin

Ciwanê kurd Hakan Arslan di dema berxwedana Sûrê ya dîrokî de jiyana xwe ji dest da. Ev serê 350 rojan e ku malbata Aslan li cenazeyê Hakan digere. Malbatê bertek nîşanî hikumeta ku Sûrê vediguherîne qereqolê da û got ku li ser cenaze û bîranînên ciwanên kurd tu avahî nikare werin lêkirin...

Medya Rûpel - 3



## AKP 30 hezar cehşên nû digire

Pergala cerdevaniyê ya ku wekî polîtîkaya kurdan bi kurdan bide şerkirin, ji aliyê hemû hikumetên tirk ve tê bikaranîn, di serdemên hikumetên AKP'ê de jî wek estrumanekê tê bikaranîn. Artêşa ku li dijî gerîlayan nikare şer bike bi teqwiyeya 30 hezar cerdevanên nû tê tehkîmkirin...

Medya Rûpel -3



## AKP'î bi eroînê hat girtin

Serokê Baskê Ciwanan ê AKP'ê yê navçeya Giyadîna Agiriyê Mehmet Akîf Yardimci û polîs Ç.A. ku parêzvanê wî ye, bi eroîna bi buhayê 1.5 milyon TL re li Sakaryayê hatin girtin. Yardimci tev li Civîna Meclisa Şêwirmendiyê ya Ber(reh a AKP'ê ku di 31'ê kanûna 2016'an de hat lidarxistin jî bûbû...

Medya Rûpel - 3

# Yekitiyê tecrîd nekin

### Gelê kurd tevî sazî û dezgeh, siyasetmedar û pêşengên xwe dixwaze di vê dema dîrokî de kurd hêza xwe bikin yek û dijberiya hev nekin. Di daxuyaniyan de hat destnîşankirin ku dema kurd bibin yek dê tecrîd jî bi dawî bibe



### ROJEVA ESASÎ YEKITÎ YE

Yekitî û kongreya neteweyî rojeva herî esasî ya gelê kurd e. Banga KCK'ê ya ji bo lidarxistina kongreyê dengvedana xwe didomîne. Li aliyê din di warê êrîşeke muhtemel a li dijî PKK'ê de hevkariya PDK'ê ya bi Tirkiyeyê re tê şermezarkirin. Rewşenbîr û siyasetmedaran diyar kir ku ji bo yekitiyê dem ev dem e.

Lêkolîner Îhsan Colemêrgî xwest ku di vê dema dîrokî û ew qas jî krîtîk de kurd ji bo parastin û pêşvebirina destkeftiyên neteweyî kongreyê li dar bixin.

Malbata Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan jî bang li hemû aliyên kurd kir û xwest ji bo yekitiyê xwêdanê birêjin û got bi tenê yekitî dikare tecrîdê bişikîne...

R7

## Dewleta tirk terorîstî kena

Nuştox Rêkeft Îsmaîlî derheqê vatişê Binalî Yıldırımî de va 'Raştîya xo de yê ke terorîstî kena, dewleta tirk a'

Nuştox Rêkeft Îsmaîlî reaksîyon nîşanê vatişanê Yildirimî ke vatbî 'PKK û PYD terosrîst î' da û va: "Dewleta tirk îdarekarê partîyê kurdan, serekê şaredarîyan, parlamenteran û hemserekan tewqîf kena û erzena hepisxaneyî. Reyna SADAT, tîmê Esedullahî û DAIŞÎ vera kurdan de xebetnena. Raştîya xo de yê ke terorîstî kena, dewleta tirk a." Parlamenterê YNKyî Mihemed Osmanî zî babete ser o va 'ganî PDK na bêvengîya Barzanîyî îzeh bikero.' ... R - 11

## Li Dîlokê li dijî midûriyeta polîsan êrîş pêk hat.


## HDP'ê da zanîn ku dengê wê 'NA' ye

AKP û MHP'ê bi 338 dengan karibû pakêta rejîma dîkta bixe rojeva meclisê. HDP'ê da zanîn ku ew tev li dengdayînê nabe...R-6



## Bankaya Navendî jî nekarî dolar erzan bike

Dolar her ku diçe buhatir dibe. Bankaya Navendî her çend 1 milyar û nîv dolar xist nav bazarê jî ev bi kêr nehat. Dolar 3,78 TL ye...R-6



## Sara, Rojbîn û Ronahî hatin bibîranîn

Jinên kurd li çar aliyên cîhanê ji bo bibîranîna her sê jinên şoreşger ên kurd û lanetkirina Komkujiya Parîsê meşiyan. Jinên mexmûrî da zanîn ku ew şopdarên Sarayan in...R-2



www.arsivakurdi.org

# 'Em ê bê deng nebin'

Li Tirkiyeyê hema bêje her roj jin tên kuştin, tacîzkirin, tecawizkirin û rastî îstîsmara zayendî tên. Ev yek derketiye asta herî roj. Nerazîbûnên jinan ên li dijî ajovanê otobusê Îbrahîm T. yê ku li Enqereyê di otobûsê de êrîşa zayendî li dijî jina rêwî pêk anî, berdewam dikin. Jinên ku ji bo êrîşê şermezar bikin li Enqereyê li otobusan siwar bûn û wiha got: "Em êrîşa zayendî ya di otobusê de hate kirin, şermezar dikin û em ê li hemberî van êrîşan bê deng nemînin û em dixwazin azad bijîn." ENQERE - ŞÛJIN









## Ew mîraseke mezin in


Li Silêmaniyê li Hola Tewar bi merasîmekê 3 jinên kurd ên şoreşger hatin bîranîn. Di merasîma bîranînê de bi sedan kes amade bûn û xelata salane ya Sakîne Cansiz dan dayika sê şehîdan ya bi navê Direxşan. Merasîmê bi deqîqeyek rêzgirtina ji bo şehîdên têkoşîna rizgarkirina gelê kurd dest pê kir û piştre mûm ji aliyê malbatên şehîdan ve hatin pêxistin. Di merasimê de endama RJAK'ê Çinur Xerîb axivî û diyar kir ku ew dengdarên heval Sara ne. Piştre sînevîzyon hat nîşandan û piştre peyama Ofîsa Parlomentoya Herêma Kurdistanê hat xwendin û di peyamê de wiha hat gotin: "Terorkirin û komkujî nikar in kurdan ji holê rakin. Di vê kurd li hemberî êrîşan bibin yek. Rê nedîn şerê kurd bi kurdan bidin kirin." Di merasîmê de peyamên partiyên siyasî, rêxistin û helbest hatin xwendin. Her wiha koma Şehîd Serhed çend stran gotin. SILÊMANÎ



Bi heman armancê sê jinên şoreşger li gundê Qirjaleyêr yê binarê Qendîlê bi sîmevîzyonekê hatin bibîranîn. Piştî temaşekirina sînevîzyonê Berpirsa Tevgera Azadiya Civaka Kurdistanê ya herêma Binarê Qendîlê, Muhabad Rojda ji li ser têkoşîna jina kurd Sakîne Cansiz axivî û diyar kir ku pêwîste jin tu carî xwe biçûk nebînin û wiha got: "Her wiha divê jin hewl û têkoşîna Cansiz û hevalên wê ji xwe re wek mîras bibînin û bi ruhê Sakîne Cansiz û hevalên wê li hemberî dijminê dagirker li ber xwe bidin." QENDÎL



Bi pêşengiya Kongra Star li bajarê Til Temir ya Kantona Cizîrê ji bo bîranîna sê jinên şoreşger civîn hat li dar xistin. Gelek kes beşdarî civînê bûn. Di civîna ku bi deqeyek rêzgirtinê dest pê kir de endama Koordînasyona Kongra Star Leyla Yeşar axivî û destnîşan kir ku ew ê tola wan hilîn in û azadiyê bidestbixin û got ku ji bo jinên bindest ew ê têkoşîna azadiyê berdewam bikin. Di dawiya civînê de sînevizyona ku li ser jiyana her sê jinên şoreşger hatibû amedekirin hat temaşe kirin. Civîn bi dirûşmeya "Şehîd namirin" bi dawî bû. TIL TEMIR






# Li ser şopa Sarayan dimeşin

**Gerîlayên YJA Starê her sê jinên şoreşger Sara, Rojbîn û Ronahî bi bîr anîn û destnîşan kir ku ew ê li ser şopa Sakîne, Leyla û Fîdanê bimeşin. Li Mexmûr, Rojava û Ewropayê jî her sê jin hatin bibîranîn**

Z.NÊRGIZ BOTAN - DÎDAR KATO / BEHDÎNAN - ANF

Gerîlayên YJA Starê her sê jinên şoreşger Sakîne Cansiz, Fîdan Dogan û Leyla Şaylemez bi bîr anîn û der barê wan de nêrînên xwe anîn ziman.

Ji gerîlayê YJA-Starê Delîla Garzan diyar kir ku nedîtina wê ya şehîd Sara ji bo wê bêşansiyek mezin e û ev tişt anî ziman: "Dema şehîd Sara û hevrêyên wê hatin qetilkirin ez nû tevlibûm. Dema ku şehîd bû bandoreke mezin li min kiribû. Piştre min dest bi lêkolîna jiyana wê kir. Min xwest jina berxwedêr nas bikim. Piştî xwedina pirtûka 'Her jiyana min şer bû' êdî min rengekî din li jiyanê nêrî. Min fêhm kir ku di nav jiyanê de çi dibe bila bibe divê mirov dest jê bernede û her tim têbikoşin. Her sê jinên têkoşer ji bo me xeta azadiyê ne. Em ê her tim şopdarên wan bin."

Rûken Ezda anî ziman ku şehîd Sara ji destpêka Tevgera Azadiyê de ji bo azadiya jinanbûye hêzeke mezin û wiha axivî: "Piştî naskirina jiyan û têkoşîna hevala Sara êdî min xwe wekî jineke xurt dît. Min ji xwe re got, jin dikare her tiştî bike. Naskirina şehîd Sara jiyana min guhert. Niha ez ji bo hemû azadiya jinan têdikoşim. Ev yek bi saya şehîd Sara bû. Heta dawiya jiyana xwe ez ê hewl bidim hêjayî têkoşîna wê bim."

**XETA AZADIYÊ YE**

Aryen Sozdar destnîşan kir ku şehîd Sara xeta wan a azadiyê ye û wiha pêde çû: "Ew şoreşgerek e navê xwe li dîrokê nivîsandiye. Şehîd Sara ewqas tişt jiya, lê qet dest ji têkoşînê berneda. Berxwedanê mezin kir. Divê jin hemû, bi taybetî gerîlayên jin xwedî li mîrateya wê derkevin."

Çiya Amed diyar kir ku şehîd Sara xwedawenda wê ye û got ku divê hemû jin jiyana wê lêkolîn bikin û bixwînin û divê ew jî wekî wê li dijî dijmin şer bikin.

Gerîlaya YJA Starê Şîlan Kobanê jî diyar kir ku ew ê heta dawiya emrê xwe wekî gerîlayeke YJA-Starê li ser şopa têkoşîna wan bê.

## Dê çalakiyên bo ronîkirinê bidomin

Ji bo şoreşgerên jin Sakîne Cansiz, Fîdan Dogan û Leyla Şaylemez ên 9'ê Çileya 2013'an li Parîsê ji aliyê dewleta tirk ve hatin kuştin, li bajarên Dresden, Darmstadt, Frankfurt, Hamburg, Berlîn, Troîsdorf, Aachen, Koln û Bonn ên Almanyayê û bajarê Toulouse yê Fransayê çalakî hatin lidarxistin. Di çalakiyên hatin li darxistin de hat gotin ku dê têkoşîna jin û gelê kurd ya ji bo ronî kirina komkujiyê berdewam bike û hat destnîşan kirin ku ew ê destûr nedin ku serê dozê were girtin. *ANF*





## Li Girkê Legê sê jinên şoreşger bi bîr anîn

Bi sedan welatî ji bajarê Dêrik, Tirbespiyê, Girkê Legê ya Kantona Cizîrê ji bo sê jinên şoreşger meşek girseyî pêk anîn û meş heta navenda bazara bajêr berdewam kir. Meşa ku bi deqeyek rêzgirtinê dest pê kir de Koordînasiyona Tevgera Civaka Demokeratîk Henîfa Hisên axivî û diyar kir ku ew komkujiya Parîsê bi tundî şermezar dikin û wiha axivî: "Dewleta Fransa bi hevkariya ligel dewleta Tirkiyeyê her sê jinên şoreşger qetilkirin. Em ê heta dawî şopdarên doz û têkoşîna wan jinên şoreşger bin."

Piştî axaftinê meş bi dirûşmeyên "Bijî Serok Apo" û "Şehîd namirin" bi dawî bû.

*GIRGÊ LEGÊ - ŞÛJIN*

## Komkujî hat lanetkirin

**LI MEXMÛRÊ** Komkujiya Parîsê bi meşekê hat şermezarkirin.

Li Wargeha Şehîd Rûstem Cûdî (Mexmûr) bi beşdarbûna hezaran kesî û bi hezaran xwendekarên wargehê bi meşek girseyî Komkujiya Parîsê hate şermezar kirin. Di meşê de gel cilûbergên reş li xwe kiribûn, posterên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, Sara, Ronahî, Rojbîn, Sêvê, Pakîze û Fatma hatin hilgirtin, pankart û dirûşim hatin berzkirin.

Piştî rêzgirtinê, li ser wateya rojê endama Koordînasyona Meclisa Îştarê ya Wargeha Mexmûrê Medya Cûdî axivî. Cûdî di destpêka axaftina xwe de sê jinên şoreşger bibîr anî û hêz û aliyên di vê komployê de cih girtî bi tûndî şermezar kir. Cûdî diyar kir ku dema Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan pêvajoya çareseriyê dayî destpêkirin ev komploya rûreş pêk hatiye û wiha got: "Ev komplo berdewamiya Komploya Navneteweyî ya li dijî Rêbêr Apo ye. Em wek gelê Wargeha Şehîd Rûstem Cûdî di serî de dewleta tirk, Fransa û hemû hêzên ku di vê komkujiyê de cih girtîn bi tundî lanet dikîn." Cudî destnîşan kir ku bi vê komkujiyê re Fransayê derbeyek mezin li hiqûqa xwe daye û li gel dijminê gelê kurd cih girtiye û wiha axivî: "Divê dewleta tirk û Fransa baş bizane ku heta ev bûyer ronî nebe em dest ji dozê bernadin." Piştî axaftina Cûdî, girseya gel bi qêrîna dirûşmên 'Bijî Serok Apo', 'Şehîd Namirin' û 'Jin Jiyan Azadî, Sara Rojbîn Ronahî' ji cihê çalakiyê belav bû. MEXMÛR - ROJNEWS

Rojeva Medya
11 Çile 2017 Çarşem

## HPG'ê şehîdên Şemzînanê bi bîr anîn

Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê gerîla Çekdar (Mûrat Beybek), Êrîş (Mûrat Îçer), Tolhildan (Mûrat Taraş), Yilmaz (Bariş Erkaçmaz), Artêş (Sedat Levet), Dunya (Selma Obût) û Şevîn (Nûran Yardimci) yên li herêma Şemzînanê jiyana xwe ji dest dan, bi bîr anî.

Di daxuyaniya HPG'ê de wiha hat gotin: "Ev ewladên leheng ên pêşeng ên gelê me ku tu carî li ber neheqiyê bêdeng neman, her roja li nava refên gerîla bi rûmetdarî û bi rengekî azad jiyan. Ev berxwedana bi heybet û bi rûmet a gelê Kurdistanê weke sekna pîroz a jiyana azad pejirandin û ji bo jiyana herî bedew biparêzin di vê oxirê de canê xwe feda kirin, şehîd bûn. Em hemû rêhevalên xwe yên di berxwedanê de şehîd bûn careke din bi rêzdarî û minetdarî bi bîr tînin û dibêjin, em ê şopdarê ruhê wan ê fedayî bin." *BEHDÎNAN - ANF*



## Ji bo 12 gerîlayan merasîm

Gerîlayên bi navê Rûbar Serhat (Denîn Aşkan), Serhat Bahrewan (Şaban Gunay), Celal Kandîl (Fazıl Kuş), Çekdar Başkale (Mehmet Siddik Orhan), Erîş Tekman (Serhan Yildiz), Navdar Masîro (Ahmet Ozer), Mazlum Colemerg (Naîm Tekîn), Gernas Aras (Fuat Akdemîr), Cîlo Ferlat (Umit Urgen), Armanc Canfeda (Ekrem Mete), Argeş Colemerg (Esmer Yıldız) ve Berxwedan ErdÎş (Umît Gurbuz) ku par 10'ê Çileyê de li Wanê hatibûn qetilkirin, ji ber sedema salvegera şehîdbûna wan li Qadên Parastina Medyayê ji hêla hevalên wan ve hatin bibîranîn. *BEHDÎNAN - ANF*


# 353 roj in cenaze nayê dayîn!

**Hakan Arslan ê ku li Sûrê jiyana xwe ji dest da, malbata wî bertek nîşan da û diyar kir ku wan çend caran ji bo girtina cenaze serlêdan kiriye, bersiva wan nehatiye dayîn û niha jî li ser cenazeyan projeyên avahiyan dixin meriyetê**

Hakan Arslan ê li Sûrê jiyana xwe ji dest da, li gel hemû hewldanên malbata wî ev 353 roj in hîn jî cenazeyê wî nehatiye dîtin, lê belê li gel vê jî li Sûrê bi dirûşmeya "Sûr bi hezkirinê pêş ve diçe" pêşnûmeya înşaatê hat destpêkirin. Bav Riza Arslan wiha got: "Li Sûrê, beriya înşaat dest pê bike bila dewlet cenazeyê kurê min derxîne yan jî bila musadeyê bidin ez ê bi xwe derxînim."

Parêzerê malbatê Ferhat Kilinç jî bi bîr xist ku roja ew hîn bûne Arslan jiyana xwe ji dest daye, wan serî li Walîtiya Amedê daye, lê qedexe û pevçûnên li navçeyê wek hincet hatine nîşandan û serlêdana wan hatiye redkirin û wiha got: "Ji ber vê em li benda bidawîbûna qedexeyê bûn. Piştî dawî li qedexe û pevçûnan hat, me 3 caran ji bo wergirtina cenaze serlêdan kir. Cenazeyê Hakan Arslan hîn jî li Sûrê ye, ne me û ne jî malbat xwe negihandiyê."

Kilinç li dijî pêşnûmaya înşaatê ya li Sûrê bertek nîşan da û wiha got: "Pêşnûmaya behsa wê tê kirin, cihê ku cenazeyê Hakan Arslan lê ye jî daxilî wê ye. Me hîn cenazeyê kurê muwekîlê xwe nedîtiye. Em vê pêşnûmeyê qebûl nakin û rast jî nabînin. Beriya pêşnûmeya înşaatê dest pê bike, divê em cenazeyê kurê muwekîlê xwe bibînin û daxwaze me jî ev e. Divê cihê înşaat lê tê çêkirin wek cihê bûyerê bê nirxandin. Divê xebata înşaatê, heta lêpirsîna cezayî temam nebe raweste." ***AMED - DÎHABER***



## Rêveberê AKP'ê bi eroînê hat girtin



Serokê Baskê Ciwanan ê AKP'ê yê navçeya Giyadîn a Agiriyê Mehmet Akîf Yardimci û polîs Ç.A. ku parêzvanê wî ye, eroîna bi bihayê 1.5 mîlyon lîreyî li Sakaryayê hatin girtin. M. Akîf Yardimci herî dawî di 6'ê Çileya 2017'an de bi îmzeya "Serokê AKP'ê yê Baskê Ciwanan ê Giyadînê" di medya civakî de parvekirin dikir. Her wiha wêne û agahiyên li ser 'Civîna Meclisa Şêwirmendiyê ya Berfireh a Meha Kanûnê ya AKP'ê ku di 31'ê kanûna 2016'an de hat lidarxistin parve kiribû. Yardimci nîşan dida ku ew jî di vê civînê de amade bû. ***STENBOL - ANF***

## Îşkence li Guzelê nexweş kirin

Ji bo Oguz Meşe yê li benda kontrolê ya polîsan a li Pulura Dêrsîmê hat kuştin, roja 15'ê kanûna 2016'an li Mala Cem a Kûrûçeşme ya Stenbolê xwarina xêrê hat belavkirin. Yek ji kesên li vê bîranînê amade bû Hasan Guzel (70) ê nexweşê kansera kolonê bû. Polîsên tirk, pankarteke li ser deriyê Mala Cemê ji xwe re kir hincet û bi bombeyên gazê êrîşî vê bîranînê kir. Derket holê ku polîsan di dema vê êrîşê de lêdaneke giran li Guzel kiriye. Her wiha Guzel bi îdiaya "propaganda rêxistinê" kiriye hat girtin. Parêzera Hasan Guzel Ayşegul Çagatay diyar kir ku ji ber ku muwekîlê wê bi kansera rûvî ye, kîsikê mîzê pê re ye, lê polîsan bi lêdanê ev kîsik teqandine. *STENBOL*



# AKP li Kurdistanê hêzên paramîlîter ava dike

Kaos û krîza ji ber polîtîkayên şerê qirêjî yê rejîma AKP-Qesrê rû da, mezin dibe. Rejîma Qesra Erdogan ku bi vê konsepta xwe ya şer jî nikare encama dixwaze bi dest bixe, hejmara cerdevanên li herêmê zêde dike û hewl dide bi vî rengî armanca xwe bi ser bixîne. Rejîma Qesrê di bin navê ewlekariyê de hewl dide mirovan bike cerdevan. Bi rengekî sergirtî dest bi avakirina hêzên xwe yên paramîlîter (kontra) kir.

Ev projeya ku wê 30 hezar kontrayên nû bên xebitandin, dê li bajarên Kurdistanê bikeve meriyetê. 15 hezar ji van dê weke cerdevana gundan bi rengekî fermî bên qeydkirin, 15 hezarên din jî dê weke cerdevanên dildar bên qeydkirin.

Ev karê ku nîşan dibe bê rejîma Qesrê xwe ji şerekî çawa yê qirêj re amade dike, xuya ye dê kaos û krîza li welêt girantir bike.

Navçeyên Rihayê yên navendî Karakopru, Eyyubiye û Halîliye jî di navê de, wê li hemû navçeyên bejahî yên bajêr di bin navê 'qoriciyên gundan ên demkî û dilxwaz' kesên paramîlîter bên xebitandin. ***RIHA - ANF***

## Helbest bû 'propagandaya rêxistinê'

Di îdianameya der barê xwendekarê Zanîngeha Çukurovayê Kamuran Kilgi yê ji ber cezayê hepsa malê bi mehan e nikare bikeve ezmûnên xwe hat amadekirin de, li ser medyaya civakî parvekirina wî ya wêneyê pismamê xwe yê tev li YPG'ê bûye û li binî heman wêneyî cih girtina helbesteke Helbestvan Ahmed Arif wek "Propagandaya rêxistinê" hat nirxandin.

Kilgi, li dijî doza lê hatiye vekirin û "cezayê hepsa malê" bertek nîşan da û ragihand ku ji ber parvekirinên civaka medyayî ev 4 meh e di "hepsa malê" de ye û hatiye mexdûrkirin. Kilgi anî ziman ku parvekirina çend ristên helbesta Ahmed Arîf wek unsûra sûc hatiye hesibandin û li dijî vê bertek nîşan da.

Kilgi anî ziman ku cezayê "hepsa malê" yên hinekan hatiye rakirin, lê ya wî nehatiye rakirin û wiha got: "Ji ber hepsa malê nikarim têkevim ezmûnên xwe. Ji bo têkevim ezmûnan min daxwazname nivîsand, lê hat redkirin. Mafên min ê perwerdehiyê ku mafê min ê herî xwezayî ye hat astengkirin. Wek xwendekarekî ev KHK bandorê li min jî kirin. Dibistana min dirêj bû û mafê min ê perwerdehiyê ji dest min hat girtin. Dixwazim dawî li vê derhiqûqiyê bê." *EDENE - DÎHABER*

## Li Enqereyê bîranîn hat lidarxistin

Kesên di 10'ê cotmeha 2015'an de, di êrîşa li dijî Mîtînga Ked, Aştî û Demokrasiyê ya Enqereyê de jiyana xwe ji dest da, di 15'emîn meha xwe de hatin bibîranîn. Bîranîna li ber Gara Trenê ya li Enqereyê ku qetlîam lê hatibû kirin hat pêkanîn, xizmên kesên jiyana xwe ji dest dane, kesên birîndar bûne û nûnerên Komeleya 10'ê Cotmehê a Aştî û Piştevaniyê (10EKÎM-DER) tevli bîranînê bûn. Di bîranînê de pankarta ku li ser wêneyên kesên jiyana xwe ji dest dayîn û nivîsa "Em ê hesab bipirsin, em ê efû nekin û ji bîr nekin" hat vekirin.

Di merasîmê de Cigirê Serokê 10 EKÎM-DER'ê Îhsan Seylan, diyar kir ku ji bo peyker li cihê qetlîamê bê çêkirin ew ê têkoşînê bidin meşandin. *ENQERE - DÎHABER*



## 338 seferên balafiran betal bûn

Barîna berfê ya zêde ya li Stenbolê bandorê li ser gelek qadên jiyanê dike. Ji ber barîna berfê ya zêde Rêyên Hewayî yên Tirk (THY) seferên balafiran betal dike. Li Balafirgeha Ataturkê ji ber balafir ranebûn, rêwî neçar man li balafirgehê li erdê razên. Rêwiyên fels û nexweş jî şandin otelan. Li balafirgehê li pêş ofisa firotina bilêtan mirov li pey hev rêz bûn. Di malpera fermi ya THY'ê de jî hat diyarkirin ku di 10'ê çileya 2017'an de li Balafirgeha Ataturk û Sabiha Gokçen ji ber berf û bahozê 338 seferên fire hatine betalkirin. Otobusên Deryayê (ÎDO) û Otobusên Deryayê yên Bursa (BUDO), gelek seferên Deryaya Marmara betal kir. *STENBOL*

## Di qezayê de du jinan jiyana xwe ji dest da

Li ser rêya di navbera Hewlêr û Kerkûkê de qezeya trafîkê pêk hat, di qezayê de du jinan jiyana xwe ji dest dan. Polisên Hewlêr têkildarî qezayê lêkolîn da destpê kirin. Têkildarî bûyerê Berpirsê Ragihandina Polîsên Hewlêr Hogir Ezîz ragihand ku qeza di navbera du wesayitên marqeya Optra û Ovio de rûdaye û wiha got: "Herdu jin piştî rakirina nexweşxaneya Hewlêrê jiyana xwe ji dest dane û têkildarî qezayê ji lêkolîn hatiye despêkirin." *HEWLÊR*

## Gola Sixkê ya Rêya Armûşê qerisî

Li navçeya Rêya Armûşê ya Wanê gola Sixkê ya ku jiyanê dide masiyan û gelek zindiyên din, ji ber sir û seqama zêde qerisî. Li gel sir û seqemê li aliyekî vê golê gelê Wanê bazirganiya lawiran dikin. Li herêmê nêzî 15 santîmetreyan berf bilind bûye. Gola Sixkê ya ku di her demsalê de bi rengê cuda xweşikbûna xwe nîşan dide, bi mij û rengê spî hate xemilandin. Gola Sixkê bi vê xweşikbûna xwe dilê gelê Wanê geş dike. *WAN*

www.arsivakurdi.org

## Li Danîmarkayê di malekê de 6 kes mirî hatin dîtin

**HAT RAGIHANDIN KU** li maleke bajarê Randers ê Danîmarkayê 4 jê zarok 6 kes mirî hatin dîtin. Polîsên Danîmarkayê der barê bûyerê de agahî nedan, lê li herêma Ulstrup a bajarê Randersê li navnîşanekê li ser îxbara rewşa biguman lêkolîn hat kirin, di malê de 4 jê zarok terme 6 kesan hat dîtin. Piştî bûyerê hêzên ewlehiyê mal xist nava kordonê û pisporên tibî û edlî li malê lêkolîn kirin. Her wiha Şaredariya Favrskovê di peyama xwe ya medyaya civakî ya Facebookê de ragihand ku ji bûyerê pir xemgîn bûne, dê sibê ji bo mamoste û xwendekarên dibistana zarokan komeke piştgiriyê amade bikin. Lêkolînkirina sedema mirina 6 kesan berdewam dike. RANDERS



## 80 kes ji ber sermayê mirin



Li welatê Macaristanê ji ber sir û seqema zêde 80 kesan jiyana xwe ji dest da. Li gorî daxuyaniya Midûriyeta Giştî ya Meterolojiyê ya Macaristanê hate gotin ku pêla sermayê zêde bû û ji ya sala 1985'an derbas bû. Yekem car pîleya sermayê ket binê -26.5'an. Hat diyarkirin ku pêla sermayê di 8'ê Çileyê de li herêma Peşte daket binê -28.1'an. Ji aliyê din ve Foruma Civakî ya Macaran di daxuyaniya xwe de ragihand ku di nava çileya îsal de ji payîzê hetanî dawiya kanûnê 80 kes qefilîn û ji ber sermayê jiyana xwe ji dest da. Li gorî agahiyên ji forumê hatin wergirtin, 20 ji wan li kolanan, 27 jê li malên xwe û 33 ji wan di rê de dema radikirin nexweşxaneyan di gel hemû mudexaleyan jî jiyana xwe ji dest da. BUDAPEŞTE

## Li Filîpînan bi dijwariya 7.3 erdhej



Li peravên deryayî yên li başûrê rojhilatê Filîpînan bi dijwariya 7.3 erdhej pêk hat. Li gorî daxuyaniya Navenda Lêkolînên Jeolojîk a Amerîkayê, erdhej 190 kîlometre li başûrê rojhilatê navenda bajare Tabiuanê pêk hat. TABIUAN

## Li Çînê balafirek ket



Li eyaleta Liaoninga ku dikeve bakurê rojhilatê Çînê balafirek ket. Li gorî nûçeya ajansa fermî ya Çînê Şinhuaye, balafireke perwerde ya aîdî şirketa Akademiya Hewageriyê ya Cilin Fuhang piştî rabûnê bi çend deqîqeyan îrtîfa winda kir û ket. Di qezaya ku li Balafirxaneya Caihu yê bajarê Fakuya eyaleta Liaoningê pêk hat de her du pîlotên balafirê jî jiyana xwe ji dest da. Hate gotin ku hêzên ewlehiyê yên çînî sedema ketina balafirê vedikolin. LIAONINGA

# Mexdûrên êrîşan dê neyên dersînorkirin

Li Almanyayê li dijî penaberan êrîşên nijadperestan roj bi roj zêdetir dibin. Piştî eyaleta Brandengûrgê eyaleta Berlînê jî ji bo parastina penaberan ket nav hewldanan û soz da ku mexdûrên êrîşan dê neyên dersînorkirin



Li Almanyayê êrîşên nîjadperest ên li dijî penaberan zêde dibin. Piştî eyaleta Brandenbûrgê, Wezareta Karên Hundir ê Berlînê jî ragihand ku ew ê penaberên mexdûrên êrîşa nîjadperest dersînor nekin.

Senatorê Wezareta Karên Hundir ê Eyaleta Berlînê Andreas Geîsel ji rojnameya Tagesspîegelê re axivî û nerazîbûneke tund nîşanî êrîşên nîjadperest da. Geîsel da xuyakirin, ku yên dibêjin 'ji bo qewirandina penaberan divê êrîş li wan bê kirin" xwe dixapînin û got: "Yên ku şîdeta rastgirên tund li wan tê kirin, dê du caran bên parastin. Dê neyên dersînorkirin."

Senatorê Karên Hundir diyar kir ku ew niha lêkolîn dikin bê mîna li eyaleta Brandenbûrgê dikarin vê biryarê bi fermannameyekê ewle bikin an na. Senator destnîşan kir ku penaberên mexdûr dê werin parastin.

Li dijî êrîşên rastgirên tund, ku bi taybetî li eyaletên rojhilatê Almanyayê li dijî penaberan rû dabûn, gava destpêkê ji aliyê eyaleta Brandenbûrgê ve hatibû avêtin û penaber hatibûn parastin. Li eyaleta Brandenbûrgê, di sala 2015'an de hezar û 581 êrîşên 'rastgiran' hatibûn kirin û ev hejmar li gorî sala 2014'an bi çar qatan zêde bûbû. *BERLÎN*

## Merkel dê penaberan bişîne

**LI ALIYÊ DIN** Serokwezîra Almanyayê Angela Merkel jî bal kişand ser serlêdanên îadeyên kesên îltîcaya wan hatiye redkirin û aşkera kir ku ew dê îadeya penaberan lezgîntir bikin.

Merkel di Yekitiya Karmendên Almanyayê (DBB) de axivî û xwest penaberên ku îltîcaya wan hatiye redkirin, bi lezgînî îade bikin. Merkel da zanîn ku divê welatên wekî Tunus, Cezayîr û Fasê wek 'welatên ewle' bên bipayekirin û got ku wan di vê derbarê de xebatên pêwîst dane destpêkirin.

Merkel anî ziman ku îadeyên li van welatan, di berpirsyariya Wezîrê Karê Hundir de nîn e û got ku divê Wezareta Karên Derve û Wezreta Pêşveçûyînê bikevin dewrê û wiha got: "Divê bazara ku bi hikumetên Tunus, Cezayîr û Fasê re tên kirin, di çerçoveya 'hurmetê' de bên birêvebirin."



## Alîkarê Bexdadî hat kuştin



Rêveberiya Artêşa Iraqê bi daxuyaniyekê aşkere kir ku li Mûsilê di êrîşên li hemberî çeteyên DAÎŞ'ê de 5 serkirdeyên DAIŞ'ê hatin kuştin. Her wiha di daxuyaniyê de hat gotin ku ji wan serkirdeyan yek alîkarê Bexdadî ye.

Li gorî heman daxuyaniyê di nava van de kesê bi navê Abdulwahid Sayr Cuan Berniyas, bi nasnav El Luweyî jî heye ku hatiye îdiakirin alîkarê Serokê DAIŞ'ê Ebu Bekir Bexdadî ye.


Dîsa hate diyar kirin ku di encama operasyonê de çeteyê bi navê Doktor Muawiye yê bi navê xwe yê rast Islam Taha Muhamed El Ubêd ku emîrê dîwana saxlemiya bajarê Kerkûkê yê DAIŞ'ê bû li navenda Hewîceyê hat kuştin.

Herwiha hatibû destnîşan kirin ku vî kesî gelek welatiyên Kerkûkê, 4 pêşmerge û gelek jinên kurd ên êzidî kuştiye û berpirsiyariya kuştina wan kiriye. *BEXDA*

## Obama danekirinên nû li Rûsyayê ferz kirin

Rêveberiya Barack Obama ku amadekariyê dike di hefteya pêş de rêveberiyê radestî Donald Trump bike, li dijî Rûsyayê biryarên danekirinên nû dan.

Li gorî daxuyaniyên Wezaretên Karên Derve û Maliyeyê yên DYA'yê rayedarekî payebilind ê rûs û du kesên tê gotin di sala 2006'an de sûikastek kiriye, li lîsteya danekirinan hatin bicihkirin.



Di daxuyaniyan de hat gotin ku yek ji van kesan Serokê Komîteya Lêkolînê ya Rûs Aleksander Bastrykîn û yên din jî Andrey Loûgovoy û Dîmîtrî Kovtoûn e, ku wek kiryarê kuştina ajanê berê yê rûs Aleksander Lîtvînenko tên sûcdarkirin. Lîtvînenko di sala 2006'an de li Londonê bi jehrê hatibû kuştin.

Hat ragihandin ku navê van kesan li lîsteya Qanûna Magnîtskî ku di sala 2012'an de hat derxistin, hatine bicihkirin û mal û milkê van kesan ên li DYA hatine desteserkirin.

Rêveberiya Barack Obama îdia dike ku di serketina Donald Trump de rola Rûsyayê heye. *WASHINGTON*

## Balyozê rûs vexwendnameya Trump qebûl kir

Hat ragihandin ku balyozê Rûsyayê yê li Washingtonê Sergey Kislyak, vexwendnameya ku ji bo tevlîbûna merasîma sondxwarina Serokê Amerîkayê Donald Trump a ku dê di 20'ê çileyê de pêk bê, qebûl kir. Sekreterê çapemenyê yê Balyozxaneya Rûsyayê li Washingtonê Nikolay Lahonin di hevpeyvîna xwe ya ajansa RIA Novostiyê de got: "Li gorî sepan û qaîdeyên protokolê balyozên biyanî jî dikarin tev li merasîma sondxwarina serokê Amerîkayê bibin. Rêvebirên amerîkî vexwendnameyek ji Balyozê Rûsyayê Sergey Kislyak re jî şand. Balyoz dê tev li merasîmê bibe." Donald Trump di merasîma sondxwarinê ya 20'ê çilê de li bajarê Washingtonê dê wezîfeya serokatiya Amerîkayê dewr bigire. WASHINGTON



## DYA: Operasyona li Deyrezorê serkeftî bû

Wezareta Parastinê ya Amerîkayê (Pentagon) da xuyakirin ku operasyona yekîneyên taybet a li bajarê Deyrezor li dijî çeteyên DAIŞ'ê hat meşandin, bi rengekî 'serketî' derbas bûye. Di daxuyaniya Pentagonê de, operasyona ku beriya niha ji aliyê Saziya Çavdêriya Mafên Mirovan a Sûriyeyê (SOHR) ve hat ragihandin, hat piştrastkirin. SOHR'ê dabû xuyakirin, ku di operasyonê de 25 çeteyên DAIŞ'ê hatine kuştin, lê di daxuyaniyê de ev îdîa 'gelekî mezin' hat binavkirin. Di daxuyaniya Pentagonê de hat destnîşankirin, ku operasyona taybet bi rengekî 'serketî' derbas bûye. Hêzên Sûriyeya Demokratîk (QSD) jî li ser vê operasyonê daxuyaniyek weşandibû û ragihandibû, êrîş li dijî konvoyeke DAIŞ'ê ku gelek payebilindên DAIŞ'ê di nav de bû, hatiye kirin. Li wîlayeta Deyrezor, ku piraniya wê ji aliyê çeteyên DAIŞ'ê ve hatiye dagirkirin, hêzên rejîmê tenê li navenda bajarê Deyrezor in. Qadeke ji çend hezar kîlometreçargoşeyî ya vê wîlayetê li aliyê rojavayê Hesekê, beriya çend mehan ji aliyê hêzên QSD'ê ve hatibû rizgarkirin. DEYREZOR



## Li Kolombiyayê pir çep wergeriya

Pira turîstîk a li bajarê Villavicencio yê Kolombiyayê ji ber giraniya zêde çep vegeriya û rê li ber karaseteke mezin vekir. Hate diyarkirin ku di qezayê de 11 kesan jiyana xwe ji dest da. Li gorî daxuyaniya berpirsên fermî yên Kolombiyayê pira turîstîk a li bajarê Villavicencioyê ku 80 metroyan ji erdê bilind e ji ber giraniya zêde çep wergeriya û di encama qezayê de 2 jê zarok 11 kesan jiyana xwe ji dest da û 14 kes jî birîndar bûn. VILLAVICENCIO

www.arsivakurd.org

# Endamekî Asayîşê hedef hat girtin





Endamê hêzên Asayîşê Qehreman Omerî di encama êrîşa li çargoşeya ewlekariyê ya bajarê Qamişloyê de jiyana xwe ji dest da. Di êrîşê de welatiyekî sivîl jî bi giranî birîndar bû.

Di şeva 9'ê çileyê saet di 19.40'an de li çargoşeya ewlekariyê ya li nêzî avahiya Berîdê (Li herêma Sebî Behrat) dema ku endamê hêzên Asayîşê Qehreman Omerî bi wesayîta xwe derbas dibû, rastî êrîşê hat. Di encama êrîşê de Qehreman Omerî jiyana xwe ji dest da û welatiyekî sivîl jî bi giranî birîndar bû. Welatiyê sivîl rakirin Nexweşxaneya El Razî ya Qamişloyê. Qehreman wek nûnerê hêzên Asayîşê li Nexweşxaneya Nûrê dixebitî.

Hevserokê Meclisa Malbatên Şehîdan a Qamişloyê Mesûm Hesen da zanîn ku dê cenazeyê Qehreman Omerî îro li Goristana Şehîd Delîl Saroxan a Qamişloyê were oxirkirin. QAMIŞLO - ANHA

## Çete dîsa sivîlan wekî mertal bi kar tînin

DILSOZ DILDAR / REQQA - ANHA

Welatiyên gundên rojavayê Reqqayê ku ji çeteyên DAIŞ'ê xelas bûne teqez kirin ku komên çete ji bo astengkirina pêşveçûyîna şervanên Xezeba Firatê sivîlan wekî mertal bi kar di anîn.

Şêniyên gundên rojavayê Reqqayê anîn ziman ku komên çete sivîlan weke mertalên zindî bikartînin. Yek ji şêniyê gundê Erîr ku nexwest navê xwe bide diyar kir ku çeteyan gefa kuştinê li wan dikir û wiha domand: "Bi saya şervanan em ji pencên çeteyan rizgar bûn. Çeteyên DAIŞ'ê ne misilman in. Herî zêde jî jinan zilm ji wan dît. Lê tiştek bi destê me nedihat."

**PLANA ÇETEYAN**

Zubeyîd El Eser jî got ku çeteyan ew weke mertalên zindî bi kar di anîn û wiha pê de çû: "Bi vê yekê dixwestin pêşiya şervanan bigirin û bi kuştina sivîlan tewanbar bikin." Zarokê bi navê Abdullah Esed jî got ku çeteyan zagonên xwe li ser wan feriz dikirin û wiha got: "Nedihîştin em pora xwe jî jê bikin. Em bi zorê dibirin mizgeftan û dixwestin em tevli wan bibin."

**KÊFXWEŞ BÛN**

Welatiya bi navê M. Y. jî kêfxweşiya xwe bi van hevokan nîşan da: "Ez xwe weke ku ji nû dayik bûme hîs dikim. Nizanim kêfxweşiya xwe ya bi xelasbûna ji komên gawiran çawa bînim ziman. Ez spasiya şervanan dikim."



# Bendava Firatê li benda şervanên xwe ye

Şervanên Xezeba Firatê ber bi Bendava Firatê ve diçin. Fermandarê HSD'ê Eşref Mustefa girîngiya bendavê wiha vegot: "Bi rizgarkirina bendavê dê rêya di navbera Reqqa û Tabqayê de qut bibe."

NÛRHAN EBDÎ / REQQA - ANHA



Fermandarê HSD'ê Eşref Mustefa da zanîn ku rizgarkirina Keleha Caberê destpêka rizgarkirina tevahiya şûnwarên Sûriyeyê ye û da zanîn ku bi rizgarkirina Bendava Firatê dê rêya di navbera Reqqa û Tebqayê de qut dibe.

Fermandar Eşref Mustefa diyar kir ku hemleya wan bi serkeftî didome û ev tişt anîn ziman: "Şervanan gelek gund, mezra, bajarok û her wiha Keleha Caberê rizgar kirin. Rizgarkirina Keleha Caberê destpêka rizgarkirina tevahiya şûnwarên Sûriyeyê ye. Çeteyan ev der weke cihekî stratejîk bikar di anîn û ev der veguherandibûn navenda fermandarên xwe. Em mizgîniya rizgarkirina tevahî gundên derdorê kelê didin gelê xwe. Em ê kelê wekî berê vegerînin meqseda bi hezaran kesî."

**70 KM PÊŞDE ÇÛN**

Fermandar Eşref Mustefa da zanîn ku şervanên wan ji baskê Qadiriyê ve 70 km'yan pêşve çûn û wiha domand: "Ji bo Bendava Firatê tenê 4 km mane. Rizgarkirina bendavê dê rêya di navbera Reqqayê û Tebqayê qut bike û ev yek jî dê hêza çeteyan a li Tebqayê lawaz bike. Serkeftinên me di gel de bawerî ava kir. Baweriya gel bi me hat û tenê li derdora Keleha Caberê 40 ciwan tevli hêzên bûn."

Bendava Firatê (Tebqa) li ser çemê Firatê ye û 50 km'yan dûrî Reqqayê ye. Bendav 4 km û nîvan dirêj û 60 m'yan bilinde. Li pişt bendavê deryaya Esed heye û 80 km dirêj û 8 km'yan jî fireh e.



## Çeteyan derbeyên giran xwarin

**KOMÊN ÇETE** yên DAIŞ'ê bi hêzeke mezin û bi çekên giran êrîşî hêzên Odeya Çalakiyan a Xezeba Firatê yên li gundên Siwêdiyayê Rojhilat û Cib Şeîr ê Eyn Îsa yê kirin. Li gorî agahiyan, di encama şerê sê rojan de êrîşa çeteyan bi temamî hat şikandin û bi qasî hatiye zelalkirin, 46 çete hatin kuştin. Şervanan dan zanîn ku hêzên wan dest danîn ser gelek cebilxaneya çeteyan. REQQA - ANHA

## 'Şahiya azadiyê nêz e'

**FERMANDARÊ** hêzên Lîwa El Tehrîr Ebû Heyder El Niêmî destnîşan kir ku hemleya wan bi serkeftinên mezin didome. El Niemî diyar kir ku serkeftina wan a herî mezin ewe ku bi vekirina korîdorên bi ewle rizgarkirina sivîlane. Fermandar da zanîn ku çete bi tu awayî nikarin pêşiya wan bigirin û wiha bi dawî kir: "Tevî mayin û xendekên çeteyan jî pêşveçûna me didome. Şervanên me bi moreleke mezin herêmê ji terorîzmê paqij dikin. Ez mizgîniyê didim gelê Reqqayê ku rizgarkirina bajêr nêz e. Her kes ji bo şahiya azadiyê amade ye." REQQA - ANHA

## Êş û azarên gelê Babê

Hevserokê Meclisa Rêveberiya Herêma Babê Ehmed Hemo da zanîn ku şêniyên Babê ji ber êrîşên artêşa tirk gelek êş û azaran dikişînin.

Artêşa tirk bi armanca dagirkirina herêma Şehbayê bi hêzên xwe yên leşkerî beyî ku destûrekî fermî werbigire, dest bi dagirkirina herêmê kir. Heta niha ji ber êrîşên artêşa tirk, bi hezaran welatî koçber bûn û gund bi tevahî hatin rûxandin. Bi vê yekê jî Tirkiye dixwaze demografiya herêmê biguherîne.

Têkildarî mijarê Hevserokê Meclisa Rêveberiya Herêma Babê Ehmed Hemo da zanîn ku gelek şêniyên Babê di bin dorpêçê de ne û ev agahî dan: "Çete, sivîlan weke mertalên zindî bikartîne. Artêşa dagirker jî van sivîlan dikuje. Heta niha gelek taxên bajêr jî bi tevahî rûxiyane." EFRÎN - ANHA

# 'Çavê min li rêya kurê min e'

SEYÎT EVRAN / MINBIC - ANF

Kurê dayika Semîre ji hêla çeteyan ve tê girtin û bi tewana diziyê destê wî tê jêkirin. Dayika Semîre got ku çavên wê li rêya vegera kurê wê ye.

Komên çete kurê dayika Semîre Alî yê bi navê Ahmed Haci Osman bi îdiaya 'diziyê' digirin. Dayika Semîrê çîroka kurê xwe wiha vedibêje: "Kurê min li gel 11 hevalên xwe bi tewana 'dizî kiriye' hat girtin. Malbatên din bi pereyan zarokên xwe xelas kirin lê Osman di destê çeteyan de ma. Kurê xwîşka min Adil Ebdulmecîd (Ebû Alî Ensarî) ku tevli çeteyan bûye, îxbar kir."



Dayika Semîre di berdewamê de jî wiha got: "Ez çûm cem çeteyan lê ji min re gotin 'kurê te dizî kiriye û destê wî dê bê jêkirin'. Min xwest kurê xwe bibînim lê nehiştin. Çend roj piştre li deriyê min xistin û min kurê xwe dît û destê wî jê kiribûn. Ez pir aciz bûm û min ji wan re got 'Xwedê belayê bide we."

Semîre Alî herî dawî jî got ku çete di dema reva bajêr de kurê wê jî birine û wiha bi dawî kir: "Dibe ku niha kuştibin. Lê her tim çavên min li rêya wî ye."



## Tirkiyeyê radest kir çeteyan kuşt

Çeteyên Tugaya Sultan Murad ciwanê ereb ê bi navê Mihemed Mustefa El Hemada yê ji gundê Tat Hums ê Raî yê ku di destê artêşa tirk de girtî bû, birin barageha xwe. Hat zanîn ku Mihemed di encama îşkenceya çeteyan de jiyana xwe ji dest da. Çavkaniyên ji herêmê dan zanîn ku hovîtiya çeteyên Sultan Murad ku ji hêla Tirkiyeyê ve tên birêvebirin a li ser gelê herêmê roj bi roj zêde dibe. Li herêmê bênavber polîtîkaya koçberkirin û guhertina demografiya herêmê tê meşandin. MINBIC



## Artêşa tirk li ser sînor dîwar ava dike

Her ku diçe liv û tevgera hêzên artêşa tirk a li hemberî gundê Silîb Qiranê Girê Spî zêde dibe. Der arê mijarê de welatiyên gund anîn ziman ku artêşa tirk li dijî gundê wan du tangên din jî bicihkirine û her wiha dîwar ava dike. Welatiyan diyar kirin ku artêşa tirk beriya demekê lêkirina dîwar û kolandina xendeqan rawestandibûn. Welatiyan dan zanîn ku artêşa tirk ji 10'ê çileyê şûnde careke din dest bi avakirina dîwar kirin. GIRÊ SPÎ



## Hezar û sed koçber gihaştin Efrînê

Pêla koçberiyê ya ber bi Kantona Efrînê ve berdewame. Di 10'ê çileyê de jî hezar û sed koçberên ku ji Bab, Reqqa, Dêra Zor, Bûkemal, Cerablus û Ezazê ji ber êrîşên artêşa tirk a dagirker, çeteyên wê û komên çete yên DAIŞ'ê reviyan, di deriyê ketina gundê Qetma yê Şera ya Efrînê hatin kantonê. Welatiyên koçber ji hêla hêzên Asayîşê ve hatin pêşwazîkirin û li cihên bi ewle hatin bicihkirin. Her wiha ji koçberên ku dixwestin derbasî Idlib û Helebê bibin jî rêyên ewle hatin peydakirin. EFRÎN

## Komuna Şehîd Hêvîdar hat avakirin

Li ser daxwaza şêniyên gundê Girê Berî, Meclisa Herêma Aliya ya Tirbespiyê bi tevlibûna dehan welatiyên gund civînek li dar xist. Di civînê de Endamê TEV-DEM'ê Fesîh Hisên diyar kir ku komun bingeha avakirina federaliya demokratîke. Di encama civînê de Rîhab Elî û Ibrahîm Xelef wekî hevserokên komuna Şehîd Hêvîdar hatin hilbijartin û komîteyên komunê jî hatin avakirin. TIRPESPIYÊ

www.arsivakurdi.org

ROJEVA Medya
11 Çile 2017 Çarşem

## Rojnameger Dayan di hucreyê de tê girtin

Rojnameger û Midûrê Karên Nivîsan ê Rojnameya Demokratîk Ulus Arafat Dayan ku 7 meh berê bi îdîaya "Endamtiya rêxistinê" û "Propaganda rêxistinê" hat girtin û şandin Sîlîfke ya Mêrsînê di yek odeyê de tê girtin. Bavê Arafat Dayan Îbrahim Dayan, diyar kir ku kurê wî diyar kiriye ku ligirtigehê rastî zextan tê. Li heman girtîgeha Silîfkeyê girtiyê bi navê Hamza Çiçekçî jî diyar kiribu ku 38 rojin di yek hucreyê de tê girtin. MERSÎN

## Euro 4 TL'î derbastir kir

Ji ber polîtîkayên şer yên dewleta AKP'ê û serokomar Tayyîp Erdogan aboriya Tirkiyeyê têk diçe. Bi zextên nîqaşên siyasî û qezencên nirxên kurewî dolar rekor şikand derket ser 3.77'ê. Euro jî ji 4 lîreyan derbas kir. Banqeya Navendî ya Tirkiyeyê ji bo pêşî li buhabûna pereyên welatên din bigire mîlyarek û 500 milyon dolar xist piyasayê lê vê yekê jî pêşî li buhabûna dolar negirt. STENBOL

## Li Zanîngeha Egeyê boykota ezmûnan

Xwendekarên akademîsyenên ku bi biryarnameya KHK'ê ji Zanîngeha Egeyê hatin îxraçkirin ji bo piştgirî bidin mamosteyên xwe biryar dan ku ne kevin ezmûnan. Xwendekarên beşên felsefe, sosyolojî, psîkolojî û ragihandinê diyar kirin ku heta mamosteyên wan paşde vegerin ew ê li berxwe bidin û çalakiyan li dar bixin.

## Dozên parlamenteran hat neqlkirin

Dozên parlamenterên HDP'ê yên Colemêrgê Selma Irmak, Abdullah Zeydan û Nîhat Akdogan bi hinceta "ewlehiyê" ji 1'emîn Dadgeha Cezaya Giran a Colemêrgê neqlî Amedê hat kirin. Serdozgeriya Komarê ya Colemêrgê ji Dadgeha Bilind re nivîsek şan û xwest daxwaza neqlkirina dozê bê nirxandin. Dadgeha Bilind jî ev daxwaz di cih de dît û biryara şandina dosyayan li Amedê da. AMED

# Destûr bidin ka em ê çawa bibêjin ‘Na’

**Berdevkê HDP'ê Ayhan Bîlgen diyar kir ku 4 şêweyên dengdayîna 'Na' hene û ji hikumetê xwest ku bila destûr bidin ka dê çawa bibêjin na. Bîlgen dubare kir ku OHAL bi belgeya sexte ya MGK'ê hatiye dirêjkirin**

Berdevkê HDP'ê Ayhan Bîlgen, di civîna koma partiya xwe de axivî. Di rojeva Bîlgen de qanûna bingehîn û jidestgirtina mafên parlamenterên HDP'ê yên girtî hebû.

Bîlgen, der barê 10'ê Çileyê Roja Rojnamegerên Dixebitin de axivî û zextên li hemberî çapemeniyê şermezar kir. Bîlgen, derbarê 3 jinên şoreşer ên di 9'ê Çileya 2013'an de li Parîsê hatin qetilkirin de jî wiha got: "4 sal derbas bûn. Li derdorê belgeyên fermî yên dewletê digerin. Lê ne ji Tirkiyeyê ne jî ji Fransayê helwestek cîdî ne hat girtin."



Li meclisê pêşnûmeyên guhertinên qanûnên bingehîn ku pêşî li dîktatoriyê vedike bi 338 dengên êrê hat qebûlkirin.

Ayhan Bîlgen di axaftina xwe ya derbarê hevdîtinên qanûna bingehîn de jî ev tiştanîn ziman: "Duh di nokteya vegerînê ya Tirkiyeyê de jî carek din bêhiqûqiyek hat jiyîn. Hêzên Ked û Demokrasiyê li ber deriyê meclisê bi awayekî mafdar ku pêşeroja xwe dihizirin ji bo gotina xwe bêjin kom bûn. Ji bo bertek û hêviyên xwe nîşanî parlamenteran bidin xwestin li ber meclîsê bên cem hev. Lê kesên ku ji 15'ê Tîrmehê ve hemû kesî dawetî parlamentoyê dikin, duh di hevdîtinên krîtîk ên qanûna bingehîn de destûr neda ku sendîka û baro bên cem hev. Bi fermana 'ger parlamenter jî bin derxînin' bi gazê êrîşî wan kirin û ji meclisê dûrxistin. Ev tabloya li ber deriyê meclisê hat jiyîn lîstikên ku li meclisê tên lîstin derdixîne holê. Ger hûn tiştekê ji gel narevînin ger ji gel re bifeyde be hûn çima ditirsin. Duh tişta hat jiyîn dê di bin vî banî de jî bê jiyîn ev reklama yekemîn a şanoyê bû. Çawa destpêkirin dê wiha berdewam bikin. Ger 330'ê bibînin dê di şertên OHAL'ê de bi kampanyayê dê ji pêkanînên Kenan Evren ên 30 sal berê cudatir nebe."

**RÊBAZA DENGDAYÎNÊ**

Bîlgen, destnîşan kir ku serlêdana hevserokên wan hebû û wiha pêde çû: "Bi fakse ji Serokê Meclîsê re ragihandin ku dixwazin deng bi kar bînin. Lê ji nedîtî ve hatin. Ne tenê serokê ku rûniştinê birêve dibe kesên li ser navê partiyan jî axivîn ji nedîtî ve hatin. Dibêjî qey li vî welatî 11 parlamenter ne di girtîgehê de ne, mafê wan tune ye, ji nedîtî ve hatin. 4 rêyên ku dengê 'Na' tê bi kar anîn heye. Ya yekemîn em ê biçin û dengê redkirinê bi kar bînin. Ya duyemîn em ê biçin dengê betalkirinê bi kar bînin, ya sêyemîn em ê dengê vala bi kar bînin û ya çaremîn jî em ê bêjin 'em di vê lîstikê de cih nagirin' û deng bi kar naynin. Destûr bidin ka em ê çawa bêjin 'Na'. Dema em diçin ser sindoqan em ne aktorên lîstikên we yên qirêjî ne. Gel em li vir bi çi peywirdar kiribin em wê dikin."

Bîlgen, diyar kir ku bi KHK'yên ku bi belgeya sexte ya MGK'ê ku OHAL hat dirêjkirin gelek sazî hatin girtin û wiha axivî: "Destkeftiyên kurdan hemû ji destê wan hatin girtin. Saziyên ku di dema Agar de jî hatine vekirin hatin girtin. Bi KHK'ê deriyê Komeleya Roboskê hat girtin. Hêjî kujerên Roboskê ne diyarin. Hêza wan têra tayînkirina qeyûm û rakirina peykerê Roboskê dike. Ji wê peykerê jî ditirsin. Ger Serokomar û endamên hikûmetê neyên darizandin dê Roboskê neyê rûnîkirin. Mesele ne pîlote rayeya ku hikûmetê daye ye." *ENQERE - DÎHABER*

# Armanc rejîma yekzilamî ye

Gelê Wanê li dijî dubare dirêjkirina dema OHAL'ê bertek nîşan da û gotin, tekane armanca OHAL'ê ne "ewlehî" pêkanîna rejîma "yekzilamî" ye.


Ji welatiyan Nûray Eray, di 6 mehên OHAL'ê de pêkûtiyên xwe dan der bi bîr xist û dest nîşan kir ku, mirin bi mebesta ji bo tirsê berbelav bikin pêk tên.

Ji welatiyan Sacîde Kizilay balê kişand, ser binçavkirin û girtinên di dema OHAL'ê de xwe didin der û wiha got: "Di bûyereke pir biçûk de jî, yek wek FETO'yî giliyê we dike û gelek hevalên min ên tu eleqeya wan bi vê rêxistinê re tune ne hatin binçavkirin." Kizilay got, bi OHAL'ê re çewisandinên li dijî azadiya ramanê 2 qat zêde bûne û anî ziman ku, ji bo rakirina OHAL'ê ji destê kê çi bê divê bike.

Kemal Guler got, ji bo dewlet nehuqûqiyên xwe li ser zemînekî qanûnî bide rûniştandin OHAL'ê dirêj dike û wiha axivî: "Di bin navê OHAL'ê de bi derxistina KHK'yan gelek sazî û aşredariyên ku vîna gel in desteser kirin. Mebesta dewletê ji vê ew e ku gel bitebisîne, rejîma xwe ava bike. Ji bo vê jî OHAL'ê dirêj dike." Guler dest nîşan kir ku, tekane armanca dirêjkirina OHAL'ê ne ji bo ewlehiyê ye ji bo amadekirina şert û mercên pergala serokatiyê ye û got, ev qethiyen nayê qebûlkirin.

Ji welatiyan Abdulakdir Çalişkan jî balê kişand ser TOMA û wesayîtên polîsan ên bi mehan li kolan û kuçeyên bajêr tên rawestandin û anî ziman ku, tekane armanca OHAL'ê ew e ku, dewlet ser sûcên xwe binixumîne. *WAN*

# Doza Yuksekdag hat taloqkirin



Derbarê 7 endamên Partiya Sosyalîst a Bindestan (ESP) ku di nav de Hevseroka Giştî ya HDP'ê Fîgen Yuksekdag jî heye doz hatibû vekirin û doz li 9'emîn Dadgeha Cezayê Giran a Edeneyê hat dîtin.

Doza ku hemû kesên bi sûcdariya "MLKP avakirine û birêvedibin" û "propagandaya rêxistinê kirine" tên sucdarkirin bêyî girtî tên darizandin Parlamentera HDP'ê Meral Daniş Beştaş jî gelek parêzer tevlî bûn. Doza bi nasadina nasnameyan destpê kir hat xwestin ku îfadeya Yuksekdag bi SEGBÎS'ê bê girtin. Yuksekdag diyar kir ku ji bo îfade dayînê ne amadeye û dê tevlî dozê nebe. Heyeta dadgehê ji bo kêmanî bên derbas kirin doz taloqî 16'ê Gulanê kir. *EDENE*

# Rojnameger girtî û betal in

Sendikaya Rojnamegerên Tirkiye (TGS) û Cemîyeta Rojnamegerên Tirkiyeyê (TGC), li avahiya TGC'ê têkildarî 10'ê Çile Roja Rojnamegerên Dixebitin bi navê "Roja Rojnamegerên Naxebitin" kom bûn û civîna çapemeniyê pêk anîn.

Di civînêde Serokê Giştî yê TGS'ê Gokhan Durmuş, Nûnerê Komeleya Rojnamegerên Hemdem (ÇGD) yê şaxa Stenbolê Ugur Guç, Sekretera Giştî ya TGC'ê Sibel Guneş û Şêwirmendê Hiqûqêyê TGC'ê Gokhan Kuçuk amade bûn. Rojnamegeran diyar kirin ku di roja ku rojnameger girtî û betal bin, pîrozkirina vê rojê bê wate ye.

Serokê Giştî yê TGS'ê Gokhan Durmuş, anî ziman ku berê 10'ê Çile wekî Cejna Rojnamegeran dihat pîrozkirin, lê niha wekî roja Rojnamegerên betal tê zanîn. Bi dehan rojnameger der barê wan de doz hatine vekirin û zêdeyî 3 hezar rojnameger betal in. Durmuş, da zanîn ku di roja ku girtî betal û girtî bin bê wate ye ku vê rojê pîroz bikin. Durmuş, anî ziman ku li Tirkiye 144 rojnameger girtî ne û wiha got: "Bi hezaran rojnameger betal in. Kijan roja ku rojnameger azad û xwedî kar bin wê demê em dê vê rojê pîroz bikin." *STENBOL*



# ‘Piştî teqînan me hedef digirin’

Rêxistinên HDP û DBP'ê yên Rihayê diyar kirin ku piştî teqînan ew hedef tên nîşandan û xwestin kesên hatine girtin bên berdan.

Di civînê de Hevseroka DBP'ê ya Rihayê Yasemîn Kiliç, axivî û wiha got: "Piştî her teqînê li şuna bûyer bê rûnîkirin kesên sivîl ên siyasetê dikin hedef tên girtin. Ji 12'ê Kanûna 2016'an heta niha li Riha û navçeyên wê di bin navê 'têkoşîna bi terorê re' 250 kes hatin binçavkirin. Gelek kesên hatin binçavkirin ew kesê ku di civakê de tên naskirin û hemû agahiyên wan li midûryetê hene ne. Ev kes endamên meclîsê û rêveberên HDP û DBP'ê yên bajar û navçeyanin. Hevserokên Wêranşar, Bozova, Xelfetî, Pirsûs û gelek cihên din hatine girtin. Em wekî rêxistinên HDP -DBP'ê yên bajar em ê siyaseta xw eya demokratîk bidomînin. Em dixwazin demildest hevalên me yên hatine girtin bên berdan." *RIHA*




www.arsivakurdi.org

# Li dijî tecrîdê yekitî

**Mehmet Ocalan bertek nîşanî tecrîdê da, bal kişand ser yekitiya kurdan û wiha got: "Tekane banga malbata me ew e ku bila kurd bên cem hev û yekitiya xwe ya neteweyî pêk bînin."**

Birayê Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, Mehmet Ocalan bal kişand ser tecrîda ku 18 sal in li ser kekê wî tê meşandin û anî ziman ku heke kurd yekitiya xwe ya neteweyî pêk bînin, dê hemû pirsgirêk çareser bibin.

Mehmet Ocalan wiha axivî: "Çi nav lê tê kirin bila bê lêkirin, mifteya çareseriya vê pirsgirêkê li Girava Îmraliyê ye. Muxatab Serok e. Kesek heye vê pirsgirêkê çareser bike, ew jî Serok e. Heke dixwazin ev pirsgirêk bê çareserkirin û dawî li vê xwînê bê, rojek beriya rojekê divê pêşî malbata wî, parêzerên wî yan jî kî dixwazin divê ji bo wan riya Îmraliyê bê vekirin. Her kes vê baş dizane. Hikumet jî baş bi vê dizane, tirk jî kurd jî baş dizanin. Ev prigsirêk ne meseleyeke ku bi kuştinê û mirinê bê çareserkirin." Mehmet Ocalan destnîşan kir ku bi tecrîdê neçareserî tê kûrkirin.



**YEKITIYA NETEWEYÎ**

Mehmet Ocalan wek malbat nêzîkatiya xwe ya ji bo yekitiya neteweyî jî ragihand û wiha got: "Em wek kurd, li ser vê xakê hatin dinyayê. Xaka me kirin 4 parçe û em ji hev veqetandin. Lê divê li gorî pêvajoya sedsala 21'emîn kurd yekitiya xwe saz bikin. Heke her kes li parçeyê lê dimîne, li gorî berjewendiyên xwe li gel dewletên dagirker tev bigere, bila baş bizanin tu fêdeya vê ji kurdan re tune ye. Gotineke mezinên me heye; 'Heke em yekitiya xwe pêk neynin dê yek ji me bibe taştê, yek ji me bibe navroj, yek ji me jî bibe şîv.' Heke îro me tune bikin, dê sibê te jî tune bikin. Dê ev heta yekitiya kurdan pêk bê wiha bidome. Dibe ku di navbera me de kêmasî hebin, lê em dikarin ji derheqê van kêmasiyan jî derkevin. Divê kurd li 4 perçeyan yekitiya xwe ava bikin."

**BANGA LI BARZANÎ**

Ocalan got ku çarenûsa hemû kurdan yek e û wiha dawî li axaftina xwe anî: "Tekane banga malbata me ew e ku, bila kurd bên cem hev û yekitiya xwe ya neteweyî çêbikin. Heke em vê pêk neyînin, ev tê wateya em xerabiyeke mezin li hev dikin. Di vê mijarê de bendewariyên me ji Mesûd Barzanî hene. Divê Mesûd Barzanî di vê mijarê de berpirsiyariyekê li xwe bike bar. Divê pêşengiya vê yekitiyê bike." *RIHA - DÎHABER*

## Li Kobanê tecrîd hat şermezarkirin

Saziya Malbatên Şehîdan ya Kantona Kobanê bi armanca şermezarkirina tecrîda girankirî ya li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan daxuyaniyek da çapemeniyê. Endamên TEV-DEM, PYD'ê, Kongreya Star, Saziya Malbatên şehîdan, Rêveberî, Hêzên Cewherî, Saziya Yekitiya Piştgiriya Gelan MLKP, Saziya mamosteyan KPCD, saziya Ciwana, Navenda Çand û Huner û bi dehan welatî di daxuyaniyê de amede bûn. Daxuyanî ji hêla endama Saziya Malbatên Şehîdan Ronahî Heco ve hat xwendin. Heco wiha got: "Em wek gelê Kobanê û bi taybetî jî saziya malbatên şehîda dibêjin, Rêber Apo rûmeta me ye. Li ser vî bingehî em dewleta faşîst ya Tirk û bêdengiya navneteweyî şermezar û lanet dikin. Em dibêjin vê çalakiyên me heyanî azadiya Rêber Apo nasekine." **KOBANÊ**



## Li dijî tecrîdê bertekên gel

Herî dawî di 11'ê îlona 2016'an de birayê Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ji bo hevdîtinê çûbû Girtîgeha Îmraliyê û ji wê rojê ve tu agahî ji Ocalan nayên wergirtin. Welatiyên kurd yên li Stenbolê dijîn ji bo dawî li tecrîda Îmraliyê bê banga pêkanîna muzakereyan kirin.

Welatiyê bi navê Ramazan Canbulut (45) jî xwest dawî li tecrîda li ser Ocalan bê û wiha got: "Em ê tev ji vêya zirarê bibînin. Wê tirk û kurd zirarê bibînin. Em hemû alîgirê aştiyê ne. Divê ev agir bitefe." Alî Şen ê 65 salî jî diyar kir ku tecrîd ne tenê li ser Ocalan, li ser hemû Kurdistanê heye. Şen wiha domand: "AKP û MHP dixwazin kurdan tune bikin. Kes ji vêya re nabêje na. Ev her du partî, li pêş kurdan astengeke mezin e." Seyfî Ugurlu yê 30 salî jî dest nîşan kir ku, weziyeta Ocalan weziyeteke 'Rêberî' ye û wiha got: "Divê Ocalan ne li girtîgehê, di nav gelê xwe de be. Siyaseta Ocalan siyaseteke baş e. Tecrubeya wî heye. Kêm mirov wek Ocalan zane hene." Murat Gulmez (32) jî diyar Ew Ocalan wek mifteya rawestandina şer dibînin. Fatîha Toprak wiha bang kir: "Çareserî di yekitiya kurdan de ye. Eger li cihekî yekitî nebe, li wir çareserî jî zehmet e." **STENBOL - ROJNEWS**

# Hiqûqa Îmraliyê li hemû Tirkiyeyê belav bû

YASÎN KOBULAN / STENBOL - DÎHABER

Ji parêzerên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan Îbrahîm Bîlmez, têkildarî rapora 2016'an a ku der barê geşedan û binpêkirina mafan ên li Girtîgeha Îmraliyê amade kirine, li dijî tecrîda li Îmraliyê bêdengiya saziyên neteweyî û navneteweyî û nîqaşên têkildarî Kongreya Neteweyî ya Kurd de axivî.

Bîlmez anî ziman ku, ew dê rapora ku der barê binpêkirinên mafan ên li Îmraliyê amade kirine de hem bi saziyên têkildar û rêxistinên civaka sivîl û hem jî bi raya giştî re parve bikin. Bîlmez wiha got: "Rewşa li Îmraliyê li ber çava ye. Tecrîd bi awayekî tund didome. Li gel vê, rewşa Tirkiyeyê jî li holê ye. Dîmenek pir tarî heye. Me heta 15'ê Tîrmehê, di sala 2016'an de 57 caran serlêdan kir, malbat jî 26 caran. Ev hemû hatin redkirin. Piştî 15'ê Tîrmehê 62 caran ji bo hevdîtina parêzeran serlêdan hatin kirin û malbatan jî 54 caran serlêdan kir. Ji bilî hevdîtineke malbatê, hemû serlêdanên me hatin redkirin. Ji xwe hemû raya giştî jî hay ji vê hevdîtinê heye."

Bîlmez diyar kir ku, hemû derhuqûqiyên li Îmraliyê berbelavî Tirkiyeyê bûne û wiha axivî: "Li Îmraliyê, muameleyên derhuqûqî yên li ser parêzeran tên sepandin, berbelavî hemû girtîgehên Tirkiyeyê bûye. Ev rewş, heta niha dide nîşandan ku li Îmraliyê veguheriye rewşeke awarte. Me ev dianî ziman, lê kesî guh nedida me. Derhuqûqiya Îmraliyê an jî 'Huqûqa Îmraliyê' berbelavî hemû Tirkiyeyê bûye." Bîlmez, li dijî tecrîdê bêdengiya saziyên mafên mirovan û Ewropayê rexne kir.



Bîlmez bal kişand ser nîqaşên yekitiya kurdan û wiha axivî: "Avakarê vê fikrê Birêz Ocalan bi xwe ye. Heta yekitiya kurdan pêk neyê, dizane dê aştî neyê erdnîgariya kurdan, neyê Tirkiyeyê û neyê Rojhilata Navîn. Ji ber vê, wî banga kongreyeke neteweyî kiribû. Lê belê ev li gel hemû hewldanan jî pêk nehat. Di vê mijarê de PDK hinekî bi dubendî tev digere."

# Ji bo yekitiyê gav divê

Lêkolîner-nivîskar Îhsan Colemêrgî têkildarî Kongreya Neteweyî ya Kurd bal kişand ser pêvajoya niha ya dîrokî.

Colemêrgî derengmayîna kombûna Kongreya Neteweyî ya Kurd rexne kir û wiha got: "Çimkî, êdî li herêmê hêzên dijberî kurdan, dewletê dest bi kişikê kiriye. Jêmayîna me ya ji kongreya neteweyî tê vê wateyê; em jî li dijî wan aktoran, wan hêzan dibêjin ku texteyê me yê kişikê ne amade ye, em ê texteyê xwe ji nû ve amade bikin. Lê belê wan ji zû ve dest bi cihguherandina lîstikvanên xwe kiriye jî."

Colemêrgî bal kişand ser pêkanînên li Rojhilata Navîn û bi bîr xist ku li herêmê tenê hêzên ku Kurdistan dagir kirine tune ne û wiha got: "Heke kurd demildest yekitiya xwe ya neteweyî pêk neynin, dibe ku windahiyên wan bikevin rojevê. Heke em ji vê trênê jî bimînin, vê carê divê em wek berpirsyar li xwe binêrin. Teqez divê em ji trênê nemînin. Li rawestgehekê em ji trênê man, li rawestgeha duyemîn û girîng, ji bo ku em ji trênê nemînin divê bi lez û bez gavên mezin bên avêtin." *WAN*

## Serdana Yildirim nîşaneya çi ye?

Bêje
**Îskan Şîvhelan**

Serokwezîrê Tirk Bînalî Yildirim çû serdana Iraqê. Di daxuyaniyan de du xal derketin holê.

✓ Tirkiye dê kampa Başîkayê vala bike.

✓ Tirkiye piştgiriya serwerî û hevpariya axa Iraqê dike.

Wateya vê zelal e. Xeyalên Tirkiyeyê yên neo-osmanî têk çûn. Wekî berpirs jî têkoşîna kurdan dibînin. Niha bi hemû hêzên ku ev şeş sal e pê re şer dikir, li hev dike.

Hamas, Mursî, Siûd, Katar, DAIŞ, Nusra û OSO tev ji bo vê yekê firotin. Li dijî van ji Rûsya, Sûriye, Iraq û Îranê dixwaze ku li dijî PKK'ê piştgiriya Tirkiyeyê bikin. Ev welat piştî polîtîkayên Tirkiyeyê yên şeş salan dê çi qas piştgiriyê bidin an nadin, ne diyar e. Ev mijara nivîseke din e.

Mijara me têkiliyên Tirkiye-Iraq û malbata Barzanî ye. Yildirim bi yek daxwazê çû Iraqê. Ji bo operasyoneke dersînor a li hemberî PKK'ê ji hikumeta Iraqê û malbata Barzanî piştgiriyê bigire.

Îbadî, bê tune piştgiriyê nade Tirkiyeyê. PKK niha ji bo Îbadî pirsgirêk nîn e. Heta li hemberî Tirkiyeyê, garantiyek e. Gelo, Îbadî çi xwest?

✓ Leşkerên xwe ji Başîkayê bikişîne.

✓ Dawiyê li destwerdana karên hundir a Iraqê bîne, bêyî destûra Iraqê petrolê ji Kurdistanê nekire.

✓ Têkiliyên xwe bi malbata Barzanî (ji ber ku parlemento hatiye girtin û hikumet tune ye) re bi sînor bike.

Wekî tê xuyan Îbadî li hemberî daxwazên Yildirim, tawîzên li dijî malbata Barzanî xwestin.

Gelo îhtîmal heye Tirkiye, malbata Barzanî di nîviya rê de bihêle. Dema em li qedera Hamas, Mursî, DAIŞ, OSO, Katar û Siûdiyê binêrin îhtîmal mezin e. Di pêşerojê de em dê bibînin.

Lê li vir tişta girîng têkiliyên di navbera kurdan de ne. Di serdemeke ev qas avantaj li pêşiya kurdan heyî de, yekitiya kurdan gelekî qels e. Kurdan yekitiya xwe ava bikira, di vê demê de çi bixwestana dê pêk bihata. Ev firset di sala 2013'an de ji dest çû. Lê hêj şans heye.

Li gorî agahiyên kulîsî di navbera PKK û PDK'ê de di demên dawîn de hind hevdîtin didomin. Lê xuya ye ku derdorên ji vê hevdîtinê aciz jî hene. Dixwazin van hevdîtinan têk bibin. Daxuyaniya Serokwezîr Nêçîrvan Barzanî ya wekî banga 'birakujiyê' çima hat dayîn, armanc çi bû, nehat fehmkirin. Wekî dînamîteke li hemberî van hevdîtinan tê xuyakirin.

Li ser vê daxuyaniya provakatîf ji Endamê Desteya Rêveber a KCK'ê Murat Karayilan, daxuyaniyeke gelekî maqûl da û bal kişand ser talûkeyê. Gelê kurd hêrseke mezin nîşanî daxuyaniya Barzanî da. Lê tirsa şerê birakujiyê ket dilê tevahiya kurdan. Daxuyaniya Karayilan, wekî avek agir bitefîne, dilê kurdan rihet kir. Bes talûke neboriye. Angajebûna malbata Barzanî ya bi AKP'ê re wekî talûkeyeke mezin li pêşiya kurdan e. Divê hem gelê kurd, hem jî tevahiya siyasetên kurd berteka xwe ya li hemberî vê polîtîkayê bînin ziman û malbata Barzanî ji vê riyê vegerînin. Li gel vê divê hemû kurd daxwaza kongreya neteweyî ji bilind bikin.

Herî dawî pêwîst e malbata Barzanî jî polîtîkaya Tirkiyeyê ya dijberî kurdan baş binirxîne. Yildirim li cem Barzanî, PYD bi terorîstiyê îtham kir. Sibê Tirkiye bi Iraqê re li hev bike, dê PYD li cem Barzanî be, ne Tirkiye. Wekî li Şengalê qewimî…

www.arsivakurdi.org

ROJEVA Medya
11 Çile 2017 Çarşem

# Ne Astana lê FEDERALÎ ew ê çareseriyê bîne

Hevseroka Meclisa Sûriyeya Demokratîk Hediye Yûsif têkildarî mijarên pêvajoya Şoreşa Rojava, federaliya demokratîk, rêveberiyên xweser, nêzikatiyên gel û hêzên navneteweyî yên li hemberî federaliya demokratîk, konsepta reşkirina hin hêzên hundir û derveyî Sûriyeyê yên li dijî federaliya demokratîk, civîna Astanayê ya ku dê di navbera Tirkiye, Rûsya û Îranê de were lidarxistin, dagirkeriya Tirkiyeyê ya li herêma Şehbayê pirsên me bersivandin.

## Projeya me hemû civakan hembêz dike

**Gelek derdorên neteweperest der barê navê federaliyê de aciz in û dibêjin ku çima Rojava hat derxistin. Hûn van rexneyan çawa dinirxînin?**

Di guhertinên reşnivîsa hevpeymana civakî de mijareke girîng jî guhertina nav bû. Di civînê de navê 'Rojava' me ji nav federaliya demokratîk derxist. Ev jî îsbat e ku projeya me ne projeyeke qewmî û etnîkî ye. Ji bo ku hemû pêkhate xwe di nav vê pergalê de bibînin, nêrîna xwe, îradeya xwe di bin sîwana federaliyê de bixin yek jî me pêwîstî bi rakirina navê Rojava dît. Di warê erdnîgarî de jixwe gelek navên wekî Rojava, bakurê Sûriyeyê û hwd. lê hatine kirin. Ji ber ku gelek netewe di vê qadê de dijîn. Peyva Rojava diviya ku ji hêla hin derdoran ve rêya nêrîna projeya etnîkî ku kurdan bêhtir esas digire jî vekira. Me jî ji bo pêşîlêgirtina nêrînên wiha pêwîstî bi vê yekê dît. Ji xwe em li dijî netewdewletê ne, em li dijî netewperestiyê ne, em li dijî sîstema navendî ne. Ji bo vê yekê hemû peyvên ku dibin nîşaneya netewdewletiyê, netewperestiyê em li dijî wan in. Navê derxistina Rojava, nayê wateya ku em ji nasnameya xwe ya neteweyî û kurdistanî şûnde gav diavêjin. Bi felsefeya neteweya demokratîk em li gel mafên gelên din, mafên gelê xwe jî diparêzin. Em vê pêngavê ji bo pêvajoyeke pêkanîna dewleteke neteweyî bi pêş naxin.

## Federalî destpêka jiyana nû ye

**Ji bo sala nû ya federaliyê hûn ê çi bibêjin?**

Em birêkûpêkkirina pergala xwe ya federal a ku bi erêkirina peymanê û lidarxistina belgeya siyasî bi dawî bû, em vê projeyê di sala nû de diyarî gelê bakurê Sûriyeyê û gelên Sûriyeyê dikin. Em di wê baweriyê de ne ku dê destpêka jiyaneke nû hem di bakurê Sûriyeyê de hem jî li tevahiya Sûriyeyê çêbe. Îspata vê jî ew e ku bi hezaran sûriyeyî ji herêmên xwe berê xwe didin herêma me û di herêma me de bi cih dibin. Ji ber ku azadî û ewlehiya xwe tê de dibînin. Ji bo vê jî banga me ji hemû hêzên siyasî, netewperest, dewletperest re ew e ku dest ji van siyasetan berdin û werin em bi hev re pergala demokrasiyê bi pêş bixin. Ji ber ku encax ew dikare pirsgirêka hemû gelan çareser bike û encax ew dikare qeyrana Sûriyeyê bi dawî bike û bi xwe re Sûriyeyeke fedaral û demokratîk ava bike û hemû gelên Sûriyeyê tê de xwedî maf û azad bijîn.

BIŞAR DURGUT / AMED

***Gelo hûn dikarin bi kurtasî pêvajoya ji beriya Şoreşa Rojava û heta niha vebêjin?***

Wekî ku hûn jî dizanin netewedewlet û siyaseta yekpartî ya navendî ya partiya Baas li rojavayê Kurdistanê beriya Şoreşa Sûriyeyê û heta niha tim li ser siyaseta yekperestî ku yek al, yek ziman, yek netew nêz dibû. Di bin pergala netewedewletê de jî gelê kurd ji hemû mafên xwe hatibû mehrûmkirin. Ji bo tunekirina çanda kurdan û pişaftinê jî di heman demê de siyaseta 'Kembera Erebî' da meşandin. Di vê çarçoveyê de bi dehan gundên ereban li herêmên kurdan bi cih kirin û axên herî dewlemend ên kurdan ku devereke gelekî berfireh bû, ji kurdan standin. Bi taybetî piştî Tevgera Azadiya Kurd ku li Bakur dest pê kir, gelê me êdî ket nav hişmendiya azadiyê, xwebirêxistinkirinê û li ser felsefeya Rêber Apo careke din hişmendiya xwe kûr kir û xwe bi rêxistin kir. Vê yekê jî tevlîbûneke gelekî xurt ji bo Şoreşa Rojava çêkir. Bi hêviyên azadiyê û li ser şopa vê fikr û felsefeyê di sala 2003'yan de PYD hat damezirandin. Lê rejîma Sûriyeyê xwe li vê ranegirt û di serhildana 12'ê Adara 2004'an a Qamişloyê de bi dehan ciwanên kurd şehîd kirin û girtin. Li dijî polîtîkaya qirkirin û tunekirinê, tevî hemû bêderfetiyan û girtina bi sedan kadroyên tevgera me gelê me li ber xwe da. Gelê kurd Şoreşa Sûriyeyê ku di 14'ê adara 2011'an de dest pê kir, gelekî baş şîrove kir. Ji ber birêxinstibûna civaka me, bi hezaran mirovên me daketin kolanan û gelê me demildest dest bi birêxistinkirina xwe kir û meclis û komîteyên xwe ava kirin. Ji bo parastina şoreşa gel jî di heman demê de hêzên YPG'ê hatin avakirin. Di 19'ê Tîrmeha 2012'an de ji Kobanê hêzên rejîmê hatin derxistin û pêngava yekemîn a şoreşê li Kobanê dest pê kir.

***Fikra Federaliya Demokratîk a Bakurê Sûriyeyê çawa bi pêş ket?***

Bêguman piştî tecrubeya 3 salan a Rêveberiya Xweseriya Demokratîk û rizgarkirina qadên di demên dawîn de, me destkeftiyên xwe mayînde kirin. Me di vê demê de karî em pirsgirêkên civaka xwe yên ewlehî, aborî, çandî, perwerde, civakî û yên dadê çareser bikin. Hêza gelan a di pergala rêveberiyên xweser de hatibû avakirin, êdî pêwîstî dît ku em pergaleke ku van kantonan hemûyan di bin sîwanekê de bîne cem hev, ava bike. Em nikarin li benda çareserkirina qeyrana heyî jî ku em qedera xwe pê ve girê bidin, bimînin. Li ser banga Koordînasyona Giştî ya her sê Kantonên Rojava, me bi tevlîbûna hemû pêkhate, hêzên siyasî û hêzên civakî ji bo derxistina pergala siyasetê meclisa damezirîner ava kir. Bi vê yekê jî îlana projeya federaliyê hat kirin. Di welateke netewedewlet a pergala navendî de ku ber bi parçebûnê ve diçe û xwedî pirsgirêkên dîrokî, civakî û neteweyan hene, me jî pêwîstî bi yekitiya gelan û pêşîlêgirtina parçebûnê û demokratîkkirina Sûriyeyê ku bikare hemû gelan hembêz bike, pergaleke xwe ya îdarî, civakî hebe, pêdivî bi federaliya demokratîk dît.

***Di nav Şoreşa Rojava de gelên li herêmê di serî de xwe di bin sîwana rêveberiyên xweser de bi rêxistin kir. Gelo çima pêwîstî bi federaliyê hat dîtin?***

Civaka Sûriyeyê ku bi taybet civaka ereb bi rastî gelekî hatiye texrîbkirin û ji mafên xwe mehrûm bûye. Ji sedî 80 pêkhateyên Sûriyeyê êdî baş dît ku çavkaniya pirsgirêkan netewedewlet û siyaseta rejîma Baasê bû. Van pêkhateyan di pêvajoya xweseriyên demokratîk de hewildan xwe bi rêxistin bikin û wiha jiyaneke azad biafirînin. Di bin sîwana xweseriya demokratîk de hîn bêtir xwe bi rêxistin kirin. Ev pergala ku maf û azadiyan mîsoger dike, pergala federal ne wekî ku hin hêz ji bo reşkirinê dibêjin 'federaliya etnîkî' ye. Federalîzma me ne li ser wî esasî ye. Pergala me, pergaleke cografîk e û yekitiya civak û pêkhateyan esas digire. Di heman demê de yekitiya Sûriyeyê diparêze.



Hevseroka Meclisa Damezirîner a Federaliya Demokratîk a Bakurê Sûriyeyê Hediye Yûsif da zanîn ku federaliya demokratîk projeyeke li dijî pergala netewdewletê ye û bi taybetiya xwe ya **pircivakî, pirrengî, pirolî, pirçandî û nenavendî rêya çareseriya herî guncaw a aloziya Sûriyeyê ye**

***We ji bo danasîna federaliyê gelek xebat di her alî de meşandin. Gelo gelên li herêmê, hêzên herêmî û qada navneteweyî pergala we çawa dinirxînin û çawa nêz dibin?***

Di destpêka îlankirina projeyê de, êrîşên pir mezin li dijî projeya me pêk hatin. Hem rejîmê, hem muxalefeta Sûriyeyê, hem dewletên herêmê ku bi taybetî Tirkiye, welatên Peravê û heta Rûsya û DYA'yê ev êrîş pêk anîn û gotin ku em li dijî parçekirina Sûriyeyê ne. Refleksên bi vî rengî hem li hundir û hem jî ji derve bi pêş ketin. Heta ku ez dikarim bibêjim hinek hêzan xwest li ser vê îstîsmarê di hundirê civaka me de fitne û fesadiyê derxin. Heta li Tirkiyeyê xwestin eşîran bînin cem hev û li dijî vê projeyê eniyekê ava bikin. Lê tevî van hewldan û propagandayên reşkirinê jî di nava xebatên 8 mehan de me karî vê projeyê bi awayekî rast ji civaka xwe, ya Sûriyeyê, herêmê û navneteweyî re ragihînin. Heta niha tu hêzan derveyî Tirkiyeyê bertekek nîşan nedaye. Gelek hêzan jî bi rengekî erênî şîrove kir.

***Di demeke ku li tevahiya cîhanê hêzên dewlet û neteweperest bi pêş dikevin de, hûn projeyeke civakî, demokratîk û modeleke nenavendî bi pêş dixin. Gelo ev ji bo we astengiyên çawa derdixe?***

Bêguman ev proje li dijî projeya netewedewletê û li dijî pergala navendî ye. Ji bo vê jî bêguman hêzên statukoparêz ên li herêmê dixwazin vê projeyê asteng bikin. Ev astengî çi ne? Mîna komên çekdar ên ku xwe bi navê Artêşa Azad didin naskirin û ji bo derxistina aloziyan û şerê li dijî me bi kar tînin. Her wiha bêhtir destekê didin terorê, hewl didin di navbera pêkhateyan de aloziyê derxin. Hewldanên îstîxbaratî, kişandina nav tehrîkan û hwd. jî hene lê di şexsê binketina DAIŞ'ê de ev siyaset hemû jî bi bin ketin. Niha jî ji bo astengkirina vê projeyê nêzikatî û guhertinên siyasî yên nû derketin holê. Piştî têkçûna hewldana 15'ê Tîrmehê ya li Tirkiyeyê, dewleta tirk ji bo xurtkirina bloka xwe û astengkirina projeya me bi Rûsya û rejîmê re hewldanên pir mezin kirin. Ji bo vê yekê jî ketin nava tifaqan. Ji bo ku Tirkiye derbasî bakurê Sûriyeyê bibe û Cerablusê dagir bike, bi rejîma Sûriyeyê re li hev kir. Li hemberî vê jî hêzên muxalefetê ji Şam û derdora wê vekişandin. Li ser vî esasî jî bi hevkariya Rûsyayê tifaq kirin. Hêzên opozîsyonê ji Idlibê hatin vekişandin û bi vî rengî guhertina rolan hat çêkirin û Tirkiyeyê jî Cerablus dagir kir. Tifaqa duyemîn jî li ser vekişandina hêzên muxalefetê li Helebê hat çêkirin. Li hemberî vê yekê jî destûra ketina Tirkiyeyê ya Babê hat dayîn. Li ser vî esasî tifaqên nû çêbûn. Tirkiyeyê jî bi dagirkirina hin herêmên bakurê Sûriyeyê xwest projeya me asteng bike. Lê di bin van polîtîkayan de siyasetên pir cuda yên veşartî jî hene. Bi vê yekê Tirkiye dixwaze siyaseta xwe ya binketî ya Sûriyeyê biparêze. Binketina DAIŞ'ê di Minbicê de û niha jî li Reqqayê, binketina siyaseta dewleta tirk e.

***Bi armanca çareserkirina aloziya Sûriyeyê; Rûsya, Tirkiye û Îran dê li Astanayê civînekê li dar bixin. Lê tevî ku hûn hêza herî demokratîk a Sûriyeyê ne jî heta niha hûn ji vê civînê re nehatin vexwendin. Gelo hûn vê civînê çawa dinirxînin?***

Rast e niha jî behsa civîna Astanayê tê kirin. Li gorî me ev civîn hê ji niha ve civîneke binketî ye. Ji ber ku ne berjewendiyên tirkan û îraniyan dibin wekhev, ne berjewendiyên tirkan û rûsan dibin wekhev, ne jî Tirkiye dikare hemû berjwendiyên wê hêvî dikir bi dest bixe. Jixwe rewşeke aloz di navbera van dewletan bi xwe de heye. Her kesekî jî xetên wî yên sor hene û tu kes ji wan jî ji van xetên xwe naçe paş.

***Mijareke din jî bêguman dagirkeriya Tirkiyeyê ya li herêma Şehbayê ye. Hûn dagirkeriya Tirkiyeyê çawa dinirxînin?***

Derbasbûna hikumeta AKP'ê û dewleta tirk li herêma Şehbayê, bêguman dagirkerî ye. Dê ev yek jî hêla gelên Sûriyeyê ve neyê qebûlkirin. Ji bo vê yekê jî gelên me dê tim di nav parastin û berxwedanê de bin. Ji ber ku Tirkiye bêyî destûreke fermî derbasî Sûriyeyê bû û axa wê dagir kiriye. Gelek sivîl hatin kuştin. Li hemberî hêzên ku gelek herêm ji terorê rizgar kirin, şer dane destpêkirin. Bêguman dê ev yek Tirkiyeyê gelekî tengav bike. Jixwe niha Tirkiye hem li welatê xwe û hem jî li derve bi pirsgirêkên gelekî mezin re rû bi rû ye. Dagirkirina axa Sûriyeyê jî dê bibe belaya serê wê. Jixwe niha hêdî hêdî nîşaneyên wê derdikevin holê

***Li dijî vê dagirkeriyê herî dawî jî Îranê nerazîbûn nîşan dan û got ku divê hêzên bê destûr ketine Sûriyeyê derkevin. Hûn van geşedanan çawa dibînin?***

Îran dê teqez qebûl neke ku Tirkiye bikeve Babê. Wê Rûsya jî qebûl neke. Ev jî dê bibe sedema nakokî û pevçûnên di herêmê de. Dê ev dagirkerî Tirkiyeyê ber bi tunebûnê ve bibe û dê Tirkiye tu qezencekê jî bi dest nexe.


***Tirkiye bi guherîna serokatiya Amerîkayê gefên mîna girtina baregeha leşkerî ya Încirlîk û hwd. dike. Hûn hatina Trump çawa dinirxînin?***

Di dema wê pêvajoyê de hemû kes li benda serkeftina Partiya Demokrat bû. Lê Komarparêz bi ser ketin. Niha jî her kes siyaseta nû ya Amerîkayê meraq dike. Ji ber ku helwestên Trump ên li hemberî terorê, yên li hemberî rêxistinên îslamî hinek jî zelal in. Ji bo vê jî metirsiyekê li ser siyaseta Tirkiyeyê ya ku bi piştgiriya rêxistinên îslamî yên li Rojhilata Navîn, çêdike. Beriya hilbijartinê dihat gotin ku dê li hemberî hêzên terorîst û îslama radîkal siyasetek were meşandin. Tirkiye jî di nav van her du beşan de ye. Siyaseta Trump a ji bo Sûriyeyê hîn ne diyar e. Lê ihtîmalek e ku dê berjewendiyên DYA'yê nexe nava talûkeyê.

www.arsivakurdi.org

## Amûreke dêrîn bînzasara

**BI HEZARAN SAL E** mirovahî di aliyê muzîk û amûrên muzîkê de xwedî çand û hunereke giranbuha ye. Hema bêje hemû civakên li ser rûyê cîhanê li gorî çand û rîtuelên xwe yên olî amûrên xwe yên taybet heye. Bêguman di çanda elewiyan de cihê tembûrê nayê nîqaşkirin, dîsa di çanda kurdan de erbane xwedî taybetmendiyeke girîng e, dîsa di çanda romenan de darbûka jî xwedî taybetmendiyeke girîng e û dikare bi hezaran amûr û taybetmendiyên civakan li vir bên rêzkirin. Lê amûreke bi navê 'bînzasara' dibe ku gelek kesan nû bihîsti be. Bînzasara amûreke perkusyonê ya japonan e û bi tevgerên zendan dilerize û deng jê derdikeve. **AMED**





## Mesele êdî dê dîjîtal be

Kovar û rêzepirtûka Mesele ya ku demeke dirêj bû dihat çapkirin, dê li ser dijîtalê weşana xwe bidomîne. Di daxuyaniya ku ji hêla kovarê ve hat dayîn de, hat gotin ku kesên meseleya wan heman bû, di heman rê de meşa xwe domandin. Kovara Mesele bi qasî 10 salan bû derdiket û demekê weşana xwe rawestandibû. Lijneya weşanê ya kovarê aşkera kir ku weşana matbû ne pêkan e û ne jî hewce ye, ji ber vê ew navberê didin weşana xwe û ew ê demekê bi formata dîjîtal weşanê bikin. Her wiha lijneya weşanê di daxuyaniya xwe de zehmetiyên weşana matbû jî parve kirin û gazinên xwe jî anîn ziman. **STENBOL**



## Goristana kesên hatine windakirin

Derhênerê ji Şiliyê Elvira Diaz demên borî me bi belgefîlma ku wî der barê Victor Jara de amade kiribû, nas kir. Diaz vê carê bi fîlma 'El Patio' (Hewş) balê dikişîne ser şoreşgerên di dema dîktatoriya Pinochet de hatine qetilkirin û ew bi dizî li goristanekê hatine veşartin. 3 xebatkarên goristaneke li paytexta Şiliyê li Santiagoyê, çîroka wan salên giran lêkolîn dikin. Di serdema dîktatoriya Pinochet de bi hezaran kesên ku hatine qetilkirin, bi dizî cenazeyên wan di vê goristanê de hatine veşartin. Karakterên Lelo û Perejil piştî van îtirafan Sergio matmayî dihêlin. **AMED**



## Dê 17 lîstik bên pêşandan

Dê di navbera 11 û 15'ê mehê de gelek lîstikên şanoyê ji hêla Şanoya Bajarê Mezin a Stenbolê ve bên pêşandan. Ji van şanoyan yek nû ye û bi giştî dê 17 lîstik bên pêşandan. Şanoyên di navbera 11 û 15'ê mehê de bên pêşandan wiha ne: Hisse-i Şayia, Orkîdeyên Li Cihê Şewatê, Xizanên Bêhempa, Bajarê Qerfî Naşît Beg, Dawî, Lîstika Lîstikê, Kesên Dereng Mane û listikên zarokan: Çîroka Koxik, Welatê Daristana Xemgîn, Her Bijî Aştî, Palyaço Prens, Mêrê Bîskuvî, Mitbaxa Tekûz, Lambeya Sêrê ya Eladdîn, Girava Zêrzemiyê, Sê Bira û Gurê Bêhempa û Rojekê Kite Sola Min. **STENBOL**



# Çandeke qedîm: Sedefkarî

Karê sedefê berî komara Tirkiyeyê bi pêş ket, di serdema komarê de ji ber xizaniyê hat ber windabûnê, herî dawî di salên 2000'î de li bajarê Dîlokê bi pêş ket û di demên dawîn de jî dîsa kêm dibe

NAVENDA NÛÇEYAN

Karê sedefê ango sedefkarî di civakên Rojhilata Navîn de karekî gelekî bi qîmet e. Lê ev çanda qedîm ji ber sersariyê roj bi roj winda dibe. Di salên borî de li gelek deverên Kurdistan û Tirkyeyê ev kar dihat kirin, lê di salên dawîn de hema bêje tenê li bajarê Dîlokê tê kirin. Ev karê ku xebateke pir baldar û hûr dixwaze, zêdetir di amûrên koşk û sera, mescîd, mizgef, dîsa deriyê gelek qonaxan, şibake, neynik, mase, dolab, sehpa, rahle, mînber, dîsa li ser amûrên muzîkê yên wekî keman, tembûr, li ser qundaxên çekan û hwd. dihatin neqişandin.

Karê sedefê yê di demên dawîn de li Dîlokê tê çêkirin, li ser gelek kel û pelên cuda jî tê çêkirin. Ev berhemên tên neqişandin, li herêmên turîstîk tên firotin û dişînin derveyî welat jî.

Ev çanda bi sedan sal e li Rojhilata Navîn tê kirin, di gelek çandên civakên cuda de jî xwedî nav û deng e. Karê sedefê di sedsalên 15 û 16'emîn de di çanda civakên li Kurdistan û Tirkiyeyê derdikeve pêş û wek karekî gelek biqîmet ê destan tê dîtin. Di gelek qesr û qonaxên padîşahan de jî atolyeyên sedefê hatine vekirin.



### DÎROKA SEDEFKARIYÊ

Tê gotin ku karê sedefê cara ewil li ser deriyê Mizgefta Kubbelî ya li bajarê Edîrneyê hatiye dîtin. Piştî vê mînaka ewil di sedsala 16'emîn de li tevahiya welat ev kar belav dibe û hema bêje li ser hemû amûrên taybet ên malan tên neqişandin. Di sedsala 17'emîn de ev kar li Stenbolê gelekî dihat kirin. Li gorî seyhatmaneya Evliya Çelebî bi qasî 500 esnafên Stenbolê tenê bi vî karî re eleqedar dibûn.



Çanda sedefê piştî ku di nava civakê de qîmeta xwe zêde bû, heta di bin banê dewleta tirk de jî beşên perwerdeyê sedefê jî tên vekirin. Yek ji wan jî di sala 1936'an de Akademiya Hunerên Xweşik a Dewletê ya Stenbolê tê vekirin û hin pisporên karê sedefê di vê akademiyê de perwerdeya vî karî didin.

### LI DÎLOKÊ BI PÊŞ KET

Karê sedefê di salên destpêka komara Tirkiyeyê de ji ber xizaniyê hema bêje ji holê radibe. Lê piştî demeke dirêj careke din li Kurdistanê bi taybetî li Dîlokê ji nû ve bi pêş dikeve. Tê gotin ku hin hostayên sedefê ku piştî derbasî Sûriyeyê dibin, ev çand li wir jî belav dibe. Dîsa li herêma Îskenderunê jî ev xebat tê kirin.

Di salên 2000'î de ev çand li Dîlokê her ku çû bi peş ket, bi vê re qîmeta ji bo van karên destan jî her ku çû zêde bû û bandoreke cidî li ser aboriya malbatan jî kir. Li ser vê yekê gelek kesan xwe di aliyê karê sedefê de xwe bi pêş xist û ev êdî bû pîşeyek.

Di roja me ya îroyîn de li Dîlokê 54 atolyeyên sedefê hene. Dîsa Atolyeya 55'emîn li Zanîngeha Dîlokê, Navenda Pêşxistin û Parastina Karên Destan a Dîlokê, di sala 1992'yan de hatiye avakirin. Li vê herêmê nexş û nemûşên herî zêde tên bikaranîn, herî zêde nexşên herêma Hatay û nexşên rûmî tên bikaranîn. Dîsa li ser amûran nexşên lale, qurnefîl, şitl, stêrk, beybûn û hwd. tên neqişandin.

Her wiha li bajarên wekî Gurgum û Semsûrê jî karê sedefê tê kirin û berhemên tên afirandin li Rojilata Navîn tên belavkirin û di bazarên herêmê de tên firotin.

# Ji bo zarokan dibistana muzîkê

Bi şoreşa civakî ya li rojavayê Kurdistanê re di hemû qadên jiyanê de saziyên gel tên avakirin. Ji van saziyan yek jî saziya çand û muzîkê ye. Ev saziyên çandê hewl didin ku ji bo pêşerojê hunermendên nû biafirînin. Destaya Çand û Hunerê ye Kantona Cizîrê ji bo fêrkirina muzîkê dibistanek vekir.

Dibistana muzîkê ji hêla Destay Çand û Hunerê ya Kantona Cizîrê li bajarê Serêkaniyê hat vekirin. Dê ev dibistana muzîkê perwerdeya çand û hunerê bide zarokan. Vekirina dibistanê bi şahiyekê dest pê kir û bi sedan welatî jî beşdarî şahiyê bûn. Di şahiyê de endamên Tevgera Çand û Hunerê ya Waşokanî derketin ser dikê û hunera xwe pêşkêş kir. Dîsa salona şahiyê bi wêneyên hunermendên kurd ên wekî Eyşe Şan, Mihemed Şêxo, Delîla, Serhad û Mizgîn hat xemilandin.

Di şahiyê de endamê Tevgera Çand û Hunerê ya Serêkaniyê Şêrîn Omerî jî axaftinek kir û ev tişt got: "Ev dibistan ji bo pêşxistina folklor û çanda gelê kurd gaveke girîng e. Dê zarok li vir hînî lêdana amûrên muzîkê bibin." Piştî axaftinan, koma Jinan a Şehîd Sakîne jî derket ser dikê û stran pêşkêş kirin.

***SERÊKANIYÊ - ANHA***



## Em ê xebatên xwe bimeşînin

Hikumeta AKP'ê bi hişmendiya xwe ya kevneperest li dijî hemû qadên civakî pêla êrîşan daye destpêkirin. Saziyên çandê jî di nav de bi sedan sazî di bin navê 'Ewlehiya neteweyî' de kilîd li deriyê wan xistin û hemû girtin. Lê rexmê vê faşîzma bêsînor jî gel bi avakirina saziyên xwe xebatên xwe didomîne.



Endama Navenda Çanda Bila Sed Kulîk Vekin (YÇKM) Nîlufer Akta têkildarî girtina saziyên çand û hunerê yên bi KHK'ê hatin girtin, axivî û aşkera kir ku ew dê li dijî êrîşa pêk hatiye têkoşîna xwe li qadên alternatîf bidomînin.

Akta destnîşan kir ku karakterê dewletê faşîzm e û ev tişt anîn ziman: "Êdî hatiye asteke wisa ku desthilatdarî vê faşîzma xwe venaşêre. Li dijî hêzên demokratîk şer hatiye îlankirin. Li dijî hemû qadan pêleke êrîşan didome. Dîsa bi girtina hunermend û xebatkaran re jî tê xwestin xebatên çand û hunerê bên rawestandin. Bi KHK'an di şevekê de gelek saziyên çand û hunerê hatin girtin. Li Stenbolê, komeleya Arzele, Med, Îdîl û Yuz Fîkîr jî hatin girtin."

Akta piştrast kir ku wan bi salan li Okmeydaniyê di bin banê YÇKM'ê de xebatên çand û hunerê dimeşandin û axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Bi armanca em bibin dengê jin û civakê me dest bi xebatan kir. Lê em ne bê alternatîf in, em ê li her qadê têkoşîna xwe bidomînin. Em bi komeleyên çand û hunerê, bi platforman re, di nav piştevaniyê de ne. Dikarin saziyan bigirin lê nikarin tu carî fikrên me ji holê rakin." **STENBOL - ŞÛJIN**

www.arsivakurd.org



# Rayîrê nêweşîyan ra xo pawitişî

**Doktoro Pispor Ozgur Mollaogluyî derheqê nêweşîyê zimistanî de qisey kerd û seba xo pawitişê nêweşîyanê zimistanî ra zanayîş da û hişyarîyanê muhîman kerd**

MERKEZÊ XEBERAN

Aşmanê zimistanî de doman, extîyar, diganî û yê ke nêweşîya zerrî, tansîyon, şeker, qesebeya sîya û gurçike înan reyde esta, ganî vera nêweşîya serdgirewtişî, grîp, sînuzît, bronşit, zature û sewbîna nêweşîyanê winasî de baldar bibî.

Nêweşxaneyê Şîşlî yê Memorîalî de Beşa Nêweşîya Zereyî ra Doktoro Pispor Ozgur Mollaogluyî derheqê rayîrê xo pawitişî yê nêweşîyanê zimistanî ra de zanayîş da.

**ZIMISTANÎ SPOR BIKERÊ**

Doktoro Pispor Mollaogluyî qiseykerdişê xo de va ‘seba vera nêweşîyan de bihêzkerdişê bedenî, gama sifteyîne pratîzekerdişê stratejîyê cuyayîşî yo’ û qiseykerdişê xo wina domna: “Cixare û çîyê tutunî yê bînî û alkolî ra dûrî mendiş muhîm o. Rojane bi hawayo nîzamin kerdişê sporî sîstemê bihêzkerdişê bedenî de zaf tesîrin o û no zî xeylê reyan ameyo îspatkerdiş. Cok ra aşmê zimistanî ke dîyayîşê rîskê enfeksîyonî tede xeylê zaf o, ganî merdim kerdişê sporî rê mabên nêdo, bi hawayo nîzamin kerdişê sporî bidomno. Çîyo ke merdim dîqet bikero, xoradayîşê cilan o; ganî goreyê demserrî cilî bêrî tercîhkerdiş. Keso ke ciwan ganî rojêk de 6-8 kîlometre rayîr şêro. Eke no kar hewayo akerde de bêro viraştiş, merdim hîna zafêr qewetin beno.”

**XO BÊHEWN MEVERDÊ**

Mollaogluyî qiseykerdişê xo de bale ant wextê rakewtişî ser û wina dewam kerd: “Seba ke bedenê merdimî hîna qewetin bibo, ganî xo bêhewn nêverdo. Keso ke ciwan ganî roje de tewr kêmî 7-8 saetan rakewo. Wextê rakewtişî de eştişê zerrîye, basincê gonîye û hûmara hilmgirewtişî kêmî beno. Seba hewnî saetê tewr munasîb mabênê 11ê şewe û 7ê sibayî yî.

**VÎTAMÎNAN BIXEBETNÊ**

Mollaogluyî qiseykerdişê xo de qala xebetnayîşê vîtamînan kerd û qiseykerdişê xo wina da domnayîş: “Eke qaso ke lazim o, sebze û meywe nêro werdiş û herinda ci de hîna zaf nano sipî bêro tercîhkerdiş, ê kesê ke wina kenî, eşkenî rojane vîtamîn û mineralan bixebetnî. Nê kesî eşkenî Selenyum, vîtamînanê A, C, E û Byî bixebetnî. Her çiqas ke ser o xeylê munaqeşeyî bêrî kerdiş zî xebetnayîşê vîtamînê Cyî seba xo grîbî ra pawitişî zaf muhîm o. Demê peynî de zaf cigêrayîşê ke kêmanîya vîtamînê Dyî beno sebebê nêweşîyanê zimistanî, ameyî viraştiş. Rayîrê berzkerdişê vîtamînê Dyî yê tewr asan tîje verde vindetiş o. Eke no mumkun nêbo o wext merdim eşkeno vîtamînê Dyî teqwîye bikero. Lazimîye ra zêdeyêr xebetnayîşê vîtamînî feyde ra vîşêr, zerar dano merdimî.

**BI DÎQET BIXEBETNÎ**

Mollaogluyî dîyar kerd ke nê demanê peyênan de bi vatişê ‘nebatî hêzê pawitişî yê bedenî qewetin kenî’ rotişê nebatan zêde bîyo û qiseykerdişê xo wina qedêna: “Her çiqas ke ameyo îspatkerdiş ke nebatê hêzê pawitişî yê bedenî gird kenî zî, mîyanê nebatan de yê ke tesîro nêbaş kenî zî estî. Ganî merdim doktorê xo ra bişewirîyo û dima ra nebatan bixebetno. Çaya keske, sîr û mastê probîyotîkî, saya mîkroorganîzmayê feydeyin û proteînan bedenê merdimî hîna qewetêr beno.”



## Şiwitişê destan xo vîr ra mekerê



**MOLLAOGLUYÎ** qiseykerdişê xo de qala xo pawitişê nêweşîyanê zimistanî kerd û wina va: “Seba xo nêweşîyanê zimistanî ra pawitişî çîyo ke sifteyîn bêro kerdiş, pakî ya. Ganî merdim goreyê qayde û quralê pakîye hereket bikero. Mîyanê pakîye de yê tewr muhîm zî pakîya destan a. Ganî destî goreyê qeydeyan bi hawayo munasîb bêrî şiwitiş. Badê ke dest ginayî tayê cayan ro, ganî merdim destê xo nêdo pirnike, çime û fekê xo ro.”

Heto bîn ra;

- ✓ Heta ke mumkun bibo, ganî cayanê padayeyan ra dûrî bêro vindetiş.
- ✓ Ganî merdim goreyê demserrî cilan xorabido, çi cilanê zaf tenikan û çi zî yê zaf qalindan tercîh nêkero.
- ✓ Ganî merdim germîya cayo ke tede maneno zî dîqet bikero; mîyanê roje de ganî germayî 24 derece, wextê rakewtişî de zî 22 derece bibo.
- ✓ Ganî kesê ke kuhenî ra dûrî bêro vindetiş û înan reyde eynî ca de nêro vindetiş.
- ✓ Ganî her serre aşma teşrîna verêne û peyêne de bi tesilî derzîna grîbî pirodîyo.
- ✓ Kesê ke nêweşîya gurçike û qeseba înan reyde esta û yê ke rakewte, extîyar û yê ke hêzê pawitişî yê bedenê înan zeyîf bîyo, ganî bin kontrolê doktorî de derzîna zatureyî pirodîyo.
- ✓ Bitaybetî cayê sey buro, ofîs û mekteban de çîyê ke sey qeleme, kitab, compîtur, qedeh û sewbîna ganî kesanê bînan reyde bi hawayo ortax nêrî xebetnayîş.
- ✓ Ganî destmalî reyêk tena bêrî xebetnayîş, pêsero pêsero nêrî xebetnayîş.
- ✓ Ganî merdim nîzamê rakewtiş û miqatebîyîşî rê dîqet bikero; bi taybetî sebze û meyweyê ke vîtamînê Cyî tede zaf o, bêrî xebetnayîş.
- ✓ Xebetnayîşê çîyê awin de zî ganî çîyo awin çi zêde germ û çi zî zêde serd bibo.
- ✓ Ganî bêzanayîş yan zî bi pêşnîyazê dermanroşan dermanî, bitaybetî zî antîbîyotîkî nêrî xebetnayîş.
- ✓ Rojê zimistanî ke tîje akewna, ganî ê rojan de merdim teber de bigêro.
- ✓ Sporê ke zaf enerjî tede yeno xerckerdiş, ganî kontrolê weşîye ra dima bêrê kerdiş.
- ✓ Seba xo pawitişê depresyonî ra ganî enejîya bedenî bêro zêdekerdiş. Sporo nîzamin, miqatebîyayîşê biweşî, hewno nîzamin û heto bîn ra embazan reyde wext vîyarnayîş, cayê karî de boya xo dayîş û sewbîna aktîvîteyê ke kêf danî merdimî, muhîm î û ganî bêrî kerdiş.

Bena hol

## Tîfaqo lêşin



U. Serhildan Xonçikij

Serekwezîrê tirk Bînalî Yildirim û kabîneya hikûmetî peynîya hewteyî de şîyî Îraq û Başûrê Kurdistanî. Nîqaşê ‘Artêşa tirk gere Başîka ra bivejîyo’ ê mabênê hikûmetê tirk û ê Îraqî ra dima raya yewine Serekwezîrê tirk şî Îraq. Nîqaşê ke Başîka ser o ameyêne kerdiş ser gelek dewlete zî fikranê xo vatbî û hetê Îraqî de vindertibî. Xura şîyayîşê Serekwezîrî ra ver goreyê xeberê ke ajansan de ca girewtbî ra merdim eşkayêne vajo mesele safî bîya û leşkerê tirkî do Başîka ra bivejîyê. La tena persêk mezgê merdiman de estbî; ‘Gelo mabênê Hikûmetê Îraq û tirkan de peymanêko senî virazîyayo?’

Şîyayîşê Serekwezîrê tirk û beyanatê ke uca de dayî na perse ra bîyê cewab. Semedo ke hikûmet fek leşkeranê xo yê ke Başîka de yê ra verado ci rê sebebêk lazim o, o sebeb zî kurd î. Çunkî di serrî ra nata polîtîkaya ke hikûmet daya vernîya xo tena kurdan ra tedayî ya. Nika zî hem rayapêroyîya Tirkîya hem zî rayapêroyîya mîyanneteweyî de xo pak biasîno û nîqaşê ke Başîka ser o ameybî kerdiş mezgê şarî ra pak bikero a polîtîka ser o rayîrî ra şono. Ê xo zî zanî ke no şîyayîş şîyayîşêko baş nîyo la semedo ke hewêk de kewtê ci û mîyanê welatî de tîfaqanê lêşinan viraştî nêeşkenî birehetî fek na polîtîka ra veradî û fikranê xo ca de bibedelnî, aye ra zî her tim verê xo danî kurdan. Semedo ke no rayîr ser de tena nêmanî her tewir tîfaqan ra hedre yî û dişmenanê xo vîzîrînan de zî eşkenî bêrê têhet, nimuneyê ci Rûsya yo.

Pêvînayîşo ke Bexda de mabênê Serekwezîr Yildirim û Îbadî de ame viraştişî ra dima beyanetêko hempar ame eşkerakerdiş û no beyanat mojna ma ke Tirkîya çîyê ke aşmêk verê cu vatbî hetêk de verdaya û semedo ke vera PKK de hêrişanê xo zêde bikera tîfaqanê neweyan virazena. Beyanat de Başîka ser o pê kerdiş eşkera bi û netîce de Şengal hedef ame girewtiş. Serekwezîrê tirk hêna PKK hedef girewt û cepheyê Şengalî tehdît kerd. Nê beyanatî kurdan ra xerîb nîyê, çunkî dewleta tirk her tim nê tehdîtan kena û peynî de xo bêhêz verdena. La çîyêko bîn û o muhîm; zîyaretîya Serekwezîrê tirk a Başûrê Kurdistanî ya. Serekwezîr û kabîneya xo Bexda ra dima verê xo dayî Hewlêr û uca de zî pêvînayîşan kerdî. Çîyêko zaf normal o ke serekwezîrê welatêk şêro Başûrê Kurdistanî. La fam beno ke no zîyaret, zîyaretêko normal nîyo. Çunkî kurdî semedo ke no prosesê krîzan ra bihêz bivejîyê wazenê bêrê têhet û kongreya neteweyî bivirazî. Û baş yeno zanayîş ke kerdenanê tay partîyan ver na kongre nêna viraştiş û çi wext bêra rojeve nê kerdenan ver nîqaşê aye zî taloq benî. Nika zî nîqaşê kongre rojeve de yî la hêna tay kerdenî mojnenê ma ke do hêna nê nîqaşî taloq bibê. Dewleta tirk payîzî ra nata operasyonê Qendîlî ser o mîyanê xo de nîqaşan kena û tena Qendîl ney wazena Şengalî ra zî operasyonêk biviraza. Xora naye ver fek Başîka ra verada û nîqaşanê bêsewîyeyan ra dima verê xo tada Îraqî. Bexda de her çî eşkera eşkera ame vatiş. La semedê ma çîyî ke Başûrê Kurdistanî de ameyî vatiş hêna muhîm ê, çunkî uca de zî PDK, tîfaqo lêşin o ke dewleta tirk wazena birona ra beşdar bî. Merdim nêzano se beno la tarîx mojneno ma ke nê tîfaqî ti wext ser nêkewtî û do ser nêkewî zî. Nê çîyan ver zî merdim gere kongreya neteweyî de israr bikero û kurdî ke wazenî mîyanê no tîfaqo lêşin de ca bigîrî hişyar bikero. Meseleya esasin tîfaqê kurdan a.

# Ganî PDK bêvengîya Barzanîyî îzah bikero

**Parlamenterê YNKyî Mihemed Osman û nuştox Rêkeft Îsmaîlî derheqê bêvengmendişê Mesut Barzanîyî yê vera vatişê Serekwezîrê tirk Bînalî Yildirimî de vatî 'ganî PDK na bêvengîya Barzanîyî îzeh bikero'**




Çend rojî verê Serekwezîrê dewleta tirk Bînalî Yildirim Herêma Başûrê Kurdistanî zîyaret kerdbî û ewja de hetê Serekê PDKyî Mesut Barzanîyî de vatbî 'PKK û PYD terorîst î'. Vera nê vatişê Yildirimî û duştê nê vatişan de bêvengmendişê Mesut Barzanîyî de her ke şono reaksîyonî zêde benî.

Babete ser o Parlamenterê YNKyî Mihemed Osman û nuştox Rêkeft Îsmaîlî qisey kerdî.

Osmanî va 'ganî dewleta tirk fek heqeretkerdişê dewleta tirkî ra verabido û kurdan reyde pîya bicuyo' û wina domna: "Qiseykerdişo ke Yildirimî Hewlêr de kerd, çîyêk rê xizmet nêkeno. Eke ma nê herême de kurd, ereb, tirk û farisî pîya cuyenî, o wext ganî ma yewbînan ra rêze bigirî. Nê şarî heme zî seba ke bişînbî qederê xo tayîn bikerî, têkoşîn danî. Ma do îzehetê ke PKK û PYDyî terorîst nîşan danî, qebul nêkerî."

**EZ ZÎ TERORÎST A**

Osmanî dewamê qiseykerdişê xo de reaksîyon nîşanê vera vatişanê Bînalî Yildirimî de bêvengmendişê Barzanîyî da û wina va: "Mesut Barzanî serekê Herêma Kurdistanî nîyo, serekê PDKyî yo. Cok ra ganî PDK bêvengmendişê Barzanîyî îzeh bikero. Eke îzeh nêkerî zî ganî bizanî ke vindetişêko ewja de ame nîşandayîş, qet baş nêbî; çimkî PKK û PYD partîyê ke xeylê şehîdê înan estî yî. Nê partîyî Xaneqîn ra heta Kobanê pawitî û xeylê şehîdê înan estî. Wexto ke gerîlayê PKKyî Mexmur pawitênê, Mesut Barzanîyî înan zîyaret kerdbî û sipasîya xo înan rê kerdbî. Mi verê cû vatbî ke 'eke PKK terorîst o, o wext ez zî terorîst a' ez nika nê vatişê xo dibare kena."

**GANÎ TIRKÎ BIVEJYÎ**

Osmanî dewamê qiseykerdişê xo de bale ant munaqeşeyê ke Şengal ra vejîyayîşê PKKyî ser o yenî kerdiş û wina va: "Nika hewl yeno dayîş ke PKK Şengal ra bêro vetiş. No çîyêko munasîb nîyo; çimkî wexto ke Şengal û Başûrê Kurdistanî ser de hêrişî virazîyayî, PKKyî pêşmergeyan reyde ê cayan pawit. PKK nê, ganî dewleta tirk hêzanê xo Başûrê Kurdistanî ra bivejo. Problemê Şengalî, problemê mîyanên yê kurdan o, o zî bi dîyalog eşkîyeno bêro çareserkerdiş. Ganî heme hêzê leşkerî yê kurdan bibî yewe." ***KERKUK - ANF***

## 'Yê ke terorîstî kena dewleta tirk a'



REBAZ HESEN - ANF

**BABETE SER O** nuştox Rêkeft Îsmaîlî zî qisey kerd û va 'dewleta tirk wazena Başûrê Kurdistanî vera Vakurê Kurdistanî de bida xebetnayîş, cok ra ganî ma hayîdar bibî' û qiseykerdişê xo wina domna: "Ameyîşê Serekwezîrê tirkan bedilîyayîşê radîkalî yê ke herême de qewimîyenî reyde eleqeder î. Bi taybetî proseso ke Rûsya, Îran, Tirkîya û Sûrîye nizdîyê yewbînan benî de zîyaretêko winasî ver ganî hukmatê Başûrê Kurdistanî hîna zaf dîqet bikerdêne. Çimkî dewleta tirk hewl dana yewna rey bi destê Başûrê Kurdistanî, Vakurê Kurdistanî ser de zextan bikera. Heto bîn ra dewleta tirk hesab kena ke operasyonê Mûsilî ra dima beşdarê dîzaynkerdişê Sûrîye biba."

**'DEWLETA TIRK TERORÎST A'**

Îsmaîlî reaksîyon nîşanê vatişanê Yildirimî ke Hewlêr de vatbî 'PKK û PYD terosrîst î' da û wina va: "Nê vatişê Yildirimî qet nînî qebulkerdiş. Dewleta tirk îdarekarê partîyê kurdan, serekê şaredarîyan, parlamenteran û hemserekanê partîyan bi hawayêko neheq tewqîf kena û erzena hepisxaneyî. Reyna SADAT, tîmê Esedullahî û DAIŞî vera kurdan de xebetnena. Raştîya xo de yê ke terorîstî kena, dewleta tirk a. Heto bîn ra zîyaretê dewleta tirkî seba partîyê PDK bî, la çapemenî de hewl danî ke nê zîyaretî sey zîyaretbîyayîşê hukmatê Başûrî nîşan bidî. La nika Parlamentoyê Başûrî kilîtkerde yo. Cok ra heme vatiş û qerarê ke ameyî girewtiş, hetê PDKyî ra ameyî girewtiş. Çimkî nika serekê fermî yê Herêma Başûrê Kurdistanî çin o."

## Kobanê de finaka têkoşînî: Mamosta **Leyla Ehmede**

Şexsê cinîyê Rojawan û Sûrîyeyî de her hetê komelî ra her roje hîkayeyê xoverdayîşî yê cîyayî yenî dîyayîş.

Nînan ra yewe zî cinîya bi nameyê Leyla Ehmeda reqqayije ke vana 'Ganî cinîyî cuyayîşêka erjane qebul nêkerî, kamcîn babete de wazenî wa xo aver bîşêrî' ya.

Leylaya ke serra 1976an de ameya dinya, 14 serreyîya xo de yena zewejnayîş. Labelê Leyla nêwazena biba cinîya keyeyî, Leyla teber ra wendişê xo domnena, unîversîte qedênena û bena mamosta. Şorişê Rojawanî ra dima Leyla beşdarê perwerdeyê kurdî bena. Leyla qala cuyayîşê xo kerde.

**MAMOSTA ROŞNÎ YA**

Leylaye va 'ez, mêrdeyê mi, 2 kênayê mi û zamayê mi ma pêro pîya 5 kesî beşdarê perwerdeyê kurdî bîyî' û wina domnaye: "Eke ma her yewe şêrî dewêk, o wext 5 dewî roşn benî. Ma bi zîhnîyetê her dewêk rê mamostayêk hereket kerd. Ez verê cû karê hêgayan de xebetîyaya, la mi bawer kerd ke ez eşkena sewbîna çîyan zî bikera. Yê ke mi ra vatî 'ti zewejîyaye ya û 4 domanê to estî' zî qerardarîya mi dîyî."

**CINÎ EŞKENÎ BIKERÎ**

Leylaye dewamê qiseykerdişê xo de va 'ez tayê şewan de bi kîtab rakewtêne' û qiseykerdişê xo wina qedênaye: "Cok ra ez vana ke kamcîn cinî bena wa bibo, eşkena xo aver bîşêra. Ganî cinîyî cuyeyêka ercane qebul nêkerî û ganî cinîyî xo ver de sînoran nêronî. Vernîya cinîyan abîyo û ganî cinîyî sazîyan de cayê xo bigirî." ***KOBANÊ - ŞÛJIN***



## Ma do reyna qezenc bikerî

Partîya Herêmê Demokratîke (DBP) badê weçînayîşê herêmî yê 30ê adara 2014 de 106 şaredarîyan qezenc kerde. Labelê qezenckerdişê xo ra dima partî ser de zextî kêmî nêbîy û 56 şaredarîyan rê qayûmî ameyî tayînkerdiş û 71 hemserekê şaredarîyan zî ameyî tewqîfkerdiş.





Babete ser o Hemsereka Şaredarîya Yenîşehîrî Ulku Baytaşe û Hemserekê Şaredarîya Karaçobanî Îrfan Sariyî qisey kerdî.

**'ÇÎYÊKO WINASÎ ÇIN O'**

Ulku Baytaşe qisey kerdişê xo de bale ante bêhuqûqîya ke înan rê ameyo kerdiş û wina va: "Huqûqo zereyîn de çîyêko winasî çin o. Şaredarî şîrket nîyî ke qayûm bêro tayînkerdiş. Dewlete huqûqê xo ser de operasyonan kena. No tesîrê qayûmî nîyo, operasyonê psîkolojîk o. Rewşa nikayîn hetê neheqîyan de teşebusê derbeya 15ê temuze ra zî vîyarna. Huqûq û îradeyê şarî ser de derbe yena kerdiş. No zîhnîyetê qirkerdişî yo. Seba ke şarî rê xizmet bikerî, qayûman nêerzenî."

Îrfan Sariyî zî bale ant polîtîkayê zextan ser û wina va: "Qayûmî, netîceyê polîtîkayan de ameyî tayînkerdiş. Hemserekê şaredarîya bi îradeyê şaran ameyî weçînayîş. Tayînkediş yeno mehneya xespî. Îxtîmalê zêdebîyayîşê reyê ma esto. Eke weçînayîş bibo, ma do reyna qezenc bikerî." ***AMED - DÎHABER***

## Xeyalê înan bi 7 hezar û 500 TLyî nîno rotiş

20ê temuze 2015 de qezaya Pirsûsî ya Riha de vera kesê ke seba hetkarîya domananê Kobanê her cayê welatî ra ameybî têhet de teqayîş virazîyabî û teqayîş ver 33 endamê Federasyonê Komeleyê Ciwananê Sosyalîstî (SGDF) merdbî. Badê teqayîşî derheqê Mudirî Asayîşî Mehmet Yapalialî de tehqîqat amebî destpêkerdiş û netîceyî de Mehmet Yapalialî rê 7 hezar û 500 TL cezaya pereyan ame dayîş.

Babet ser o kesê ke teqayîş de birîndar bîbî, qisey kerdî.

**QERAR AMEBÎ DAYÎŞ**

Yasin Canî qiseykedişê xo de wina va: "Ma cezaya pereyan qebul nêkenî. Teqayîş ra tena yew polîs berpirsîyar nîyo. No mehkemekerdişêko formalîte yo. Yarîyê xo bi ma kenî. Sewbîna cayan de zî vera merdiman de qetlîamî virazîyayî. Ancax ma bibî yew ma eşkenî na gonîye bidî vindarnayîş. Netîceyê tehqîqatî verê ra dîyar o. Ma do hesabê ci bipersî.

**HENDE ERJAN NÎYO**

Onur Kartalî zî qiseykedişê xo de wina va: "Eke doze bi hawayo edaletin biameyêne muhakemekerdiş do rayîrê merganê bînan bigirîyayêne. Cuyê 33 kesan bi 7 hezar û 500 TL nîno rotiş, ma do hesab bipersî."

Verfeka SGDFyî Ceren Çobane zî va 'eke qetlîyam nêro roşnkerdiş do her roje mergî bibî' û wina domnaye: "No qerar de kamî qetlîyam kerdo û kamî emr dayo, dîyar o. Raştîye her kesî ra yena nimitiş. Cezaya ke seba Mudirê Asayîşî ameya dayîş, ceza ra vîşêr sey xelate ya." ***RIHA - DÎHABER***



Ceren Çoban



Yasîn Can



Onur Kartal




www.arsivakurdi.org

ROJEVA
# Medya
11 Çile Çarşem 2017

ROJEVA MEDYA
Ararat Basın - Yayın
Reklamcılık Adına

İmtiyaz Sahibi:
Murat SEKMEN

Yazı İşleri Müdürü:
Mehmet Çetin ALTUN
*Yönetim Yeri:* Kooperatifler
Mahallesi Akkoyunlu
4. Sokak Sarıca Apt. 2/3
*Yenişehir-DİYARBAKIR*

*Tel:* 0 (412) 224 35 93
Baskı *(ÇAP):*
*İstanbul:* Gün Matbaacılık,
Reklam, Film, Basım, Yayın,
Tan. San. Tic. Ltd. Şti. Telsizler
Mevkii Beşyol Mah.

Akasya Sok. *No:* 23/A
*Küçükçekmece İSTANBUL*
*Tel:* 0 (212) 580 63 81
*Adana:* Arslan Güneydogu
Gazetecilik,
Matbaacilik, Kağıtçılık

Yeni Doğan Mah. 2108 Sok.
*No:*13/A *Yüreğir / ADANA*
*Tel:*0 (322) 346 03 71-72
Yaygın Süreli Yayın
*e mail:*
rojevamedya@hotmail.com



Rojnivîska

## Fotografekê



Selmet
**GULER**
selmetberfin@hotmail.com

# Titûna Xursê


Xaltiya Xedra; "çardeh salî bûm dema ez dame mêr. Min nedizanî jinîtî çi ye û nedizanî mêr çi ye." Xaltiya Xedra û Xalê Mûsa di hundirûyê kavilê aşekî avê de li ber lodeke titûnê rûniştibûn. Pelên baş û nebaş ji hev û din vediqetandin, dema me ji reş de dabû devê derî. Xaltiya Xedra destê xwe hilda, tiliya xwe bi Xalê Mûsa ve kir "Wextê wî ez xwestim dayika min ez kişandin quncikekî, ji bo his neçe kesekî çarika xwe kêşa ber devê xwe, xwe bi ser min de xûz kir, devê xwe kire ber guhê min "em te bidin mêr kurmamê te Mûsa." Nizanim çima lê destegul min gotibû 'na' lê peyva min pere nekiribû û ez dam."

Xalê Mûsa di kêleka xaltiya Xedra de peliyên navoşk û peliyên serik ên titûnê ji nav loda titûnê ya li ber wan komkirî bi giranî ji hev dikir. Xaltiya Xedra dema qala xwestina xwe kiribû Xalê Mûsa bê deng di ber xwe de bi kirkirîn dibişirî. Gava Xaltiya Xedra gotibû "lê peyva min pere nekiribû û ez dam" Xalê Mûsa serê xwe rakir, di nava roniya zenûn a hundirûyê aşê xirabe de ku bi zorê me roniya bîbikên çavên hev ditefsiland, li min nihêrî. Peliyekî sor ê serik di dest de. "Beriya min bi yekî din re erê kiribûn Xedra. Dema min bihîst keçmama min bi yekî din re erê kirine min hew ber xwe dît û ji eyarê xwe derketim. Esra teng bû. Wek dînekî ji aqilketî min nedizanî ez çi bikim. Li vî alî û li wî alî diketim. Di navbera çem û gund de bê wate diçûm û dihatim. Roj qulipt, reş kete erdê lê wekî agir bûm hê. Bezîm odeya ku salaweqat tiving lê. Tivinga bavê xwe ku her tim bi pîjekî ve daliqandî bû hilgirt, tevirkî kire dest û rast berê xwe da taxa mala mamê xwe. Lê ez neçûm mala mamê xwe. Çûm mala cînarekî wan. Bi jina cînaran re xeber rêyî mamê xwe kir. "Ez di rêya keçmama xwe de me, keçmama xwe bi dev kesî ve bernadim, welew ku ez di oxira wê de bêm kuştin an jî bibim kujerê hin kesan." Ya herî girîng min ji jina cînar re wiha tembî kiribû; "bêje mala mamê min bê Mûsa tevî darê tivingê hatibû." Xalê Mûsa peliyê serik yê ku li ber roniya êvarê wek çîkekî zêr lê hatibû, danî ser loda peliyên serik ya li kêleka xwe. Hinekî rawesta Mûsa, paşê "Min nexwestibû tevî darê tivingê bidim devê deriyê mala mamê xwe, em mam û kurmamê hev bûn, kêmasiya mamê min kêmasiya min bû, lewra çûbûm mala cîranên mamê xwe." Xalê Mûsa destê xwe avête cigareya devê xwe ku di dev de bûbû qunik, mizeke tûj lê da, paşê virkî avêt derve û ji dera mayî dîsa gotina xwe domand. "Haya dê û bavê min ji vê ya min kirî, tune bû. Piştî bihîstin û deng bi gund ket pismamên me ketin navbera me û Xedra dane min. Wek cezayek bi qelenekî giran dane milê me ku bi salan em ji bin derneketibûn."

Xalê Mûsa dema gotibû "Xedra dane min" destê xwe bi xaltiya Xedra ve kir, bi keviya lêvan li rûyê wê bişirîbû. Xaltiya Xedra jî berê xwe da xalê Mûsa û bi rûçikekî fediyok li rûyê wî bişirîbû.

*09.10.2016 Xurs*





## TEORIYEKE KEVN
## ji nû ve ket rojevê

Li ser çêbûna Heyvê ku 4,5 milyar sal in wek peyka cîhanê li dorê digere, teoriyeke berê ku hatibû piştguhkirin, ji nû ve ket rojevê.

Li gorî vê yekê hê Heyv bi embriyonên planetê yên li fezayê ava dibû, ji parçeyên ku ji cîhanê qut bûn, çêbûye.


Zanyarên îsraîlî ku endamên Enstîtuya Zanistan a Weîzmannê Ralûca Rûfû jî di nav de ne, li ser çêbûna Heyvê sîmulasyoneke dijîtal amade kir.

Encamên vê lêkolînê di kovara Nature Geoscience de hatin weşandin. Di çarçoveya vê lêkolînê de, qonaxa proto ya cîhanê û ketina embriyonên planetan ên ji Marsê biçûktir li Cîhanê, hatin sîmulekirin. Her cara ku ev embriyon li Cîhanê ketin, parçe ji Cîhanê qut bûn û her yek ji van parçeyan bû 'Heyveke biçûk'. Piştre ev parçeyên Heyvê bûn yek û heyva heyî afirand.

Di lêkolînê de hat tespîtkirin ku dema ev lihevketin gelek caran hat dubarekirin 'Heyvên biçûk' ber bi hev ve kişiyane û ev parçeyên bûne yek, veguherîne cismekî yekpare. Hat ragihandin ku ji bo piştrastkirina vê sîmulasyonê pêwîstî bi lêkolînên kûrtir heye. ANF

# Komuna nanê tenûrê ya jinan

**Nanê tenûrê yê ku jinên hezoyî bi awayekî komunal çêdikin rastî eleqeyeke mezin tê. Jinan diyar kir ku ew bi vê komunê hem debara xwe dikin hem jî digihîjin tama nanê tenûrê û got ku nanê wan digihîje gelek bajaran**







Li taxa Kale ya Hezoya Êlihê, 6 jin bi awayekî komunî nanê tenûrê çêdikin û bi firotina van nanan debara xwe dikin. Ji van jinan Emîne Kaya anî ziman ku ew 2 sal e nanê tenûrê çêdike û got ku eleqeyeke mezin bi nanê tenûrê heye. Kaya diyar kir ku ew debara xwe bi nanê tenûrê dikin û wiha axivî: "Li vir, bi giştî em 6 jin dixebitin. 3 hevalên me serê sibê, 3 hevalên me jî danê êvarê dixebitin. Rojê em 7 tenûran lê dixin. Ji her tenûrê 24 nan dertên. Rojaneya me tê 20 TL'yî. Li vir bi çêkirina nan em debara xwe dikin."

Kaya destnîşan kir ku eleqeyeke zêde bi nanê tenûrê heye û wiha domand: "Nanê li vir tê çêkirin li firinan û marketan tê belavkirin. Mirov tên vir sîparîşê didin. Em jî li gorî van sîparîşan nan dipêjin. Nanê em çêdikin, tenê li Hezo û Êlihê nayê firotin, heta bajarê Îzmîr, Antalya, Bursa û Stenbolê jî tê şandin."

Kaya anî ziman ku nanê tenûrê erzantir e û li gorî firinan paqijtir tê çêkirin û wiha got: "Dema em ji firinan nan dikirin hem tehma wan nexweş e hem jî zû hişk dibe. Lê belê nanê tenûrê ne wisa ye, tehma wî xweştir e û bisihetir e."

***ÊLIH - DÎHABER***





# Dîrok jî gelê kurd jî li dijî asîmîlasyonê li ber xwe didin

Girê Pagos ê bi navê xwe yê rojane Kadîfekale li derveyî Îzmîrê, beriya zayînê di serdema 4'emîn de ji aliyê qralê Makedonyayê Îskenderê Mezin ve hat çêkirin û şopên serdema helen, roma, bîzansê ya serdema navê bi akropol, şano, stad, bouleuterion, prytaneion, perestgeh, kemerên avê, dîwarên bircan, bi cadeyên fireh û avahiyên ku ji gir ber bi deryayê ve diçin bajarekî benderê yê bazirganiyê bû. Lê îro tenê li rojavayê kelehê 5 qul û li başûr jî beşek dîwarê kelehê mane. Aliyê din hemû hilweşiyane. Keleha dîrokî ya ku bûye şahidê gelek şer û xirakirinan îro jî dibe şahidê berxwedana kurdên ku ji ber zextên dewletê neçar mane ku koçber bibin. Malbatên kurd ên ku piranî ji Nisêbîn û Mahserta Mêrdînê koçî kelehê kirine, li vir her çi qas ji cih û warên xwe dûr bin jî çanda xwe didomînin.

Jina bi navê Hawliye Aktaş a ku 4 sal in li kelehê nanê tenûnê dipêje û difiroşe, diyar kir ku wan di salên 90'î de ji neçarî koçî Îzmîrê kiriye û anî ziman ku ew li dijî asîmîlasyona ku li ser wan tê ferzkirin li ber xwe didin û wiha got: "Me tu carî zimanê xwe winda nekir. Her tim bi zarokên xwe re bi kurdî diaxivim. Dema ku zarok bi tirkî diaxivin ez aciz dibim. Ez dibêjim çi dibe bila bibe bi zimanê xwe biaxivin."

Her wiha welatiyê bi navê Cemal Acar jî diyar kir ku wî di sala 1986'an de ji Mêrdînê koçî Îzmîrê kiriye û destnîşan kir ku ev her tim rastî nêzîkatiyeke nexweş hatine û gotinên xwe wiha bi dawî kirin: "Em li vir di warê çandî de li ber xwe didin. Bi salan e em çanda xwe diparêzin û em ê heta dawiyê jî çanda xwe biparêzin." **ÎZMÎR - DÎHABER**









# Xebatên sererastkirina kanalîzasyonan didomin



Şaredariya Gel a bajarê Serêkaniyê xebatên çareserkirina pirsgirêka rûdana kolandina erdê bajêr didomîne. Di vê çarçoveyê de şaredarî kanalîzasyonên bajêr sererast dike. Şaredariyê kanalîzasyonên taxa Ronahî û rêya Til Helef sererast kirin.

Li ser mijarê endamê Rêveberiya Gerînendeya Fenî Ibrahîm Taha da zanîn ku xebatên sererastkirinê li taxa Ronahî û rêya Til Helef bi dawî bûne û anî ziman ku ew hêj xebatên sererastkirina kanalîzasyonên bajêr didomînin. **SERÊKANIYÊ - ANHA**